# welat

Sal:3 Hejmar:109 20–26 Adar 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî


*Apê Mûsa:*

**'Vêca lawo ez çi bibêjim!'**

*Rûpel 16*



## *Ji bo Cejna Kurd*

# NEWROZ



*PKK'ê bang li gelê Kurdistanê kir*

# 'Di mala xwe de pîroz bikin'

*Rûpel 8*

# Selama Yezdanê bi edl li ser we be

Ronakbîrên hêja; berpirsiyarên xwedî rûmet, berpirsiyarên karger

Rexneyeke min bi sebebê hevpeyvîneke di rojnameyê de hatibû weşandin. Ev rexneya min zû hat weşandin hin jî bê hêl. Ez dilgeş bûm. Gelek spas. Hûn her bijîn. Wisa kêfxweş bûm ku dixwazim spasdariya xwe li gerdûnê belav bikim.

Bi guman im û bi bawerî me bi rewşa we ya hemdemî. Ev dema nûjen bêhêliya di îdeolojiyan de pir cihek mezin digire. Hûn berpirsiyarên rojnameyê ne. Bi rastî hûn çêtir dizanin, ku dem dema zanyariya hemdemiya xwendevanên Welat yên hêja jî dizanin. Lê hema min xwest vê rastiyê bînim rojevê.

Mirov bala xwe dide jiyana civakî ya vê dema nûjen, lê tê dîtin ku mafên mirovahiyê di gerdûna nûjen de, weke mafê masiyên deryayan û çivîkên çolan nema ye. Îro serokên gelan bi piranî dagirker in, bêdilêş in, çavbirçî ne û talanker in. Rastî bi wan re nîn e. Wijdanên wan kefikî bûne. Hişê xwe xwarine. Eqilên wan çerqiliye. Ji bil êrîşkirina bi ser bêqebehatan û mirovên qels pê ve tiştek nakin.

Dem çiqas nû dibin, zanebûn çiqas bi pêş ve diçe, xweşî û şahiya jiyanê çi rengî zêde dibe welê dem kevintir dibe. Çunkî tê dîtin ku ev zanebûna nûjen di riya hovîtî û barbariyê de tê bikaranîn. Ji ser vî awayî jî hezar mixabin ku ronakbîr, rewşenbîr û zanayên hemdemî (!) jî çavên xwe ji van bûyeran re digirin. Guhên xwe digirin û xwe li keriyê girê didin. Dengê mezlûman nabin xwe. Wisa tê xuyan ku ev bûyer wiha bidome, wê dîroka gerdûnê çavên van ronakbîran birêje. Wê heft qat di binê erdê re bi xwar ve bikevin.

Bi dîtina min ku ez jiyana civakiya vê demê temaşe dikim mirovatî wisa bi paş ve dageriyaye û bi xwar ve ketiye, dema pêşiya dîrokê ku jiyan di binê şikeftan de bûye, incax weke îro bû. Zilm û zordariya di nav me de, di nav alema heywanan de nîn e. Rûmetgirtina heywanan ji rûmetgirtina mirovan qat qat çêtir e.

Çi gelê Tirk, çi gelê Kurd mirovek îro li dîroka pêşiya sê çar qern berê, bi çavekî ronakbîrê nûjen mêze bike, wê bibîne û fêm bike ku rewşa wê demê û vê hingê bi çi rengî ye. Bi rastî, bêguman wê bi tepan li çokên xwe bixe. Wê dilê wî bişewite. Wê mezlûmiyetî û zalimtiyê bibîne. Bêguman wê lanet li hinek rejîm û rejîmkaran bibarîne.

Ji ber vê awayî daxwaziya xwe ya ji bo şewq û şemala dîroka me li ser rojên nû du car dikim.

***Ayhan***

## Çiya

Gava çiya biaxivin...
Bi kevir û dar û kaniyê xwe
ve
Ka çend govend û dîlan
Ew şahid bûn jê re.
Gava çiya bêjin
Çîroka xwe
Wê rûpelek, kirinek
Rabûnek.
Her rêzek
Her bangek
Û şer û cengek
Her gotinek
Navê şehîdekî
Her tîpek
Lêdana dilê hevalekî.
Gava çiya dilê xwe vekin
Û bêjin..
Çiqasî tîn bûbûn
Bi hesreta biharê bûn.
Belê îro..
Deşt jî bûne çiya
Welat jî tev bûye çiya
Zîndana me jî bûye çiya.

***H.Çawîş - Z. Ceyhan***

## Helbesta azadiyê!

Ev xortên hêja derketine serê çiyan
Dibêjin hevalino rabin ser piyan
Qêrîn dikin xwişk û bira, bav û diyan
Welatê xwe bi şer xelas kirin, ne bi hêviyan

Îro roj roja me ye, ey xortên Kurdan!
Zincîra tirsê bişkînin, çekan bidin destan
Bila dijmin bitirse weke her caran
Dîroka şerê azadiya xwe bike destan

Azadî pirr xweş e, bindestî zor e
Ala rengîn kesk û sor û zer e
Evîna me Kurdistana azad e, ne yar e
Xortino rabin ne zû ye, êdî dereng e

Şewqa tava azadiyê da ser Kurdistan
Ronahî bir her aliyên erd û ezman
Gulan rengê xwe vekir serfiraz bûn gulistan
Berxwedan bûn me şiyarên li nav Kurdistan

Gelî xortên Kurd û Mediya
Êdî rabin ser piya derên çiya
Dijmin bikujin eynî wek koviyan
Bistînin heyfa hezar salên çûyiyan.

***Dêrsim Rodî/ Batman***



**Cejna Newrozê li gelê Kurd û hemû gelên din ên bindest pîroz be. Ew agirê ku pakrewanan bi laşê xwe pêxistine û geş kirine bila ta roja azadiyê venemire.**

**Rojnameya Welat**

# Nivîsara Welat

## Welat di sê saliya xwe de hem diaxive hem jî dimeşe

*Em vê hefteyê nirxandineke salane li ser Rojnameya Welat ku ji aliyê berpirsiyarê me yê Ewrûpayê Amed Tîgrîs ve hatiye nivîsandin, diweşînin.*

Welat du saliya xwe berî çend hefteyan tije kir. Pîroz be! Di jiyana çapemeniyê de du sal hem tiştek nîn e û hem jî gelek tişt e. Ji ber ku du sal gelekî kurt e. Zarokekî du salî incex dikare dest bi axaftinê bike. Rojname jî wiha ye. Di nav du salan de hîn rojname bi cîh nabe. Dezgeh baş rûnanê. Kesên xebatkar baş hevdu nas nakin. Tempoya xebatê bi ser û ber nameşe. Tecrûbe kêm in. Zimanekî yekgirtî tune. Ji aliyê din ve, du sal demekî dirêj e. Mirov dikare di nav du salan de, bi riya rojnameyeke heftane an jî rojane gelekî tişt bike. Lê, bi dîtina min ev yek ji bo rojnameyên me Kurdan nelê ye. Berî her tiştî em Kurd ne azad in. Her roj heta her saet rojnamevan û xebatkarên Kurdan di bin çewsandin û lêdanê de ne. Di bin tirs û lerza kuştinê de ne. Ew ji aliyê madî û manevî ve bêîmkan in.

Em Kurd wiha bêîmkan in ku hîn di prosesa muneqeşekirina alfabeyê de ne. Bi hûr û mûran ve, bi hezaran sergêjiyên me yên ziman hene. Hîn bi salan em nikarin wan rast bikin an jî, ji wan re çareseriyekê bibînin. Di rewşeke wiha de, gelo mirov di navbera du salan de dikare çiqas mesafe bigire?

Dîsa jî nivîskar û xebatkarên Welat di navbera du salan de xebatên hêja pêk anîn. Zimanê Kurdî gelekî bi pêş ve birin. Xebatkar û berpirsiyarên rojnameya Welat di destpêkê de, ji aliyê zimên û gramerê ve, ji hevalên li Ewrûpayê alîkariyê dixwestin; lê niha wiha xuya ye ku piraniya ew nivîsarên ku ji derê welat diçin ji aliyê zimên, naverok û gramer ve, ew bi xwe rast dikin. Ev serkeftin û sefiraziyeke hêja ye. Bi riya Welat nivîskarên ciwan û nû derketin holê. Hîn jî dê derbikevin. Bi hezaran Kurd hînî xwendina Kurdî bûn. Ev yek ji nameyên ku ji Welat re tên jî tên xuyan. Xwendevan di nameyê xwe de dinivîsînin ku bi rê û sayeya Welat zimanê Kurdî yê nivîskî hîn bûne û dibin. Ev hemû berhem û hilberînên Welat ên berbiçav in. Encama xebata du salan in. Ev encam û berhem mirovê Kurd serfiraz û serbilind dike. Encama berhem û hilberînên du salan, nivîskar û xebatkarên Welat hîn bêhtir li kar sor û germtir dike. Helbet bi vê pêşketinê re çewtî û şaşî jî hene. Goşt bêyî hestî nabe. Zevî çiqas baş bê cotkirin, tevirkirin û avdan jî, dîsa bêgiya, pîzikê û tevrik nabe. Di nav zeviya genim a herî baş de, zîwana reş jî derdikeve.

Dema mirov bi awayekî baldar û bi giştî li hejmarên dawiyê yên Welat binêre, mirov bêhtir kêmahî û çewtiyan di nûçeyan de dibîne. Hevalên ku nûçeyan amade dikin dixwazin Kurdiyeke nû çêbikin an jî bi kar bînin. Ji ber vê yekê jî, li gotinên nû digerin. Carinan ew bi xwe gotinan çêdikin û carinan jî hinek gotinên ku bihîstine, lê baş nizanin ku mirov çawa û li ku bi kar tîne, bi kar tînin. Wê demê jî, çewtî û şaşiyên mezin derdikevin holê. Carinan jî dema nûçeyan ji Tirkî werdigerînin, ew dixwazin gotin bi gotin wergerînin. Ew dibêjin qey di hevokê de gotinek ji ya Tirkî kêm be an jî wekî wê ne be, dê qiyamet rabe, çi bibe. Ez dixwazim ji hinek nûçeyan çend mînak bidim:

"…. Kirinên kiryar nediyar protesto kirin." Tiştekî ji vê hevokê fêm nabe. Ev, ji sedî sed gotin bi gotin ji Tirkî wergerandine. Yanî bi Tirkî "faîlî meçhul cinayetlerî protesto ettî" ye. Mirov dikare wiha bibêje; "kirinên kontrgerîlla protesto kirin." Di cihekî din de "ji ber pesta dewletê" dinivîsînin. 'Pest' çi ye? Pest ne 'baski' ya Tirkî ye, "basinc" e. Baskiya Tirkî "çewsandin" e. Di nûçeyeke din de jî "pêkutiya polîsan gelekî bala xelkê kişand." 'Pêkutî' çi ye? Ev gotineke çêkirî ye. Armanc "îşkence" ye. Îşkence bi xwe, bi Kurdî ye. Tirkan ji Kurdî girtine û kirine "îşkence." Di hejmareke din de jî dinivîsîne ku " Kurd tên binçavkirin." Di Kurdî de binçavkirin tune ye. Ma pêwist e ku mirov ji biwêja an jî gotina Tirkî ya "gözlemaltina almak" re "binçavkirin" bibîne? Rastî "hatine girtin" e. Ji aliyê siyasî ve jî gotina binçavkirin" ne rest e. Dewleta Tirk ji bo xwe demokrat nîşan bide gotinên nerm û xweşik çêdike û ji girtinê re dibêjin "binçavkirin." Heger mirov bi baldarî Welat bixwîne gelek gotinên wiha dibîne. Mesela "avahîçêker" çi ye? (hejmar 106, rû. 11, Ji Ciwanên DEP'a Stenbolê)

Ya herî baştir dema her hejmar ji çapê re amade dibe, çend kes, ji nû ve nivîsaran bixwînin. Ev yek. Ya diduyan jî, divê piştî çapkirin û belavkirina her hejmarî, hemû xebatkarên navenda rojnameyê kom.bibin ji serî heta dawiyê rojnameyê ji her aliyî ve, di çav de derbas bikin û kêmahî û çewtiyên wê tesbît bikir.. Ji bo hejmarên pêş, her wiha bikaribin pêşî li çewtî û şaşiyan bigirin, an jî wan kêm bikin.

Belê, Welat di sê saliya xwe de hem diaxive, hem dimeşe û hem jî mezin dibe. Ew ji her aliyî ve ciwan dibe. Bi kurtahî rind û mezin dibe. Bila destên Welatiyan ter û şîn be! Jiyana Welat dirêj be û li hemû Kurdan jî pîroz be!.

**Amed Tîgrîs**




*Kurd û Ewrûpiyên demokrat bi pankartên PKK'ê meş li dar xistin ji bo piştgiriyê bidin têkoşîna Kurdan.*

# Demokrat û dostên gelê Kurd ên Almanî ji bo 'Azadiya Kurdistanê' dimeşin

**Almanya, Welat–** Roja 12.3.1994'an ji 70 rêxistin û saziyên demokrat li Almaniyayê bêhtir ji 5 hezar kesî meşek li dar xistin.

Meşvanên ku li bajarê Bonnê paytexta Almanyayê ev çalakî pêk anîn, di bin van dirûşmeyan de dimeşiyan: "Azadî ji bo Kurdistanê, Ji bo serxwebûna gelê Kurd, Na ji bo qedexekirina PKK, ERNK û hemû rêxistinên Kurd, Bila alîkariyên aborî û leşkerî ji bo KT'ê rawestin."

Meşvan di bin alên ERNK û pankartên balkêş ên cihêreng de meşiyan. Bi dirûşmeyên mîna "Bijî PKK" û "Bijî Gelê Kurdistan" diqîriyan. Ji hêla din ve meşvan, bi nêzî 5 hezar polîsan ve hatibûn dorpêç kirin. Dixwestin ku alên ERNK'ê werin xwar. Lê meşvanan ev nepejirandin. Li dawiya meşê pirr axaftin hatin kirin. Di nav de yek ji hêla girtiyê Zîndana Dusseldorfê A. Haydar Kaytan bû. Bi firehî li ser helwesta dewleta Alman û piştgiriya wê ji bo KT'ê di şerê qirêjî de, ku li dijî gelê Kurdistanê bi rê ve dibe rawestiya.

Piştî ku livbaziya meşê dawî bû, polîsên Almanî bi otobusên bi dû meşvanan ketin, ji bo tehdîtkirin û kontrolê. Otobusa ku ji bajarê Brauonscheweigê hatibû 50 kesên Almanî yên demokrat hildigirt. Ev otobus bi 20 mînîbusên polîsan û bi bêhtir ji 150 polîsî hatibûn dorpêçkirin. Polîsan bi awayekî hovîtî meşvan ji otobusê daxistin. Ji wan xwestin ku destên xwe hildin û bidin pişt serê xwe. Demokratên Almanî li hember vê helwestê nêzî nîv saetê bi yek dengî di rûyê polîsan de qîriyan û gotin: "Bijî PKK".

# Mûxabîrê Gündemê Nazim Babaoğlu winda ye

**Navenda Nûçeyan–** Mûxabîrê Rojnameya Özgür Gündemê Nazim Babaoğlu, ji roja 12'ê Adarve winda ye û jê tê endîşekirin ku tiştek pê were.

Babaoğlu roja êvara îdê, li ser xwestina Murat Yoğunlu ji Buroya Ruhayê diçe Sêwirekê. Bi riya telefonê Yoğunlu wiha dibêje: "Nûçeyeke pir girîng heye, divê yek ji we mûheqeq were Siwêrekê hûn îhmal nekin! Pir girîng e." Ji ber ku xebatkarên rojnameyê jî ew nas dikin pê ewle dibin û Nazim Babaoğlu ji bo nûçeyê diçe Siwêregê.

Piştî ku Nazim du rojan nayê malê, bavê Nazim û nûnêrê buroya Ruhayê Bayram Balci diçin Midûriya Emniyetê, li Nazim dipirsin Emniyet dibêje: "Me ew nedîtiye." Nûnêrê Buroyê Balci û bavê Nazim şikayeta Murat Yoğunlu dikin.

Roja din Midûriya Emniyetê bangî Bayram Balci û bavê Nazim Îbrahîm Babaoğlu dikin û Murat Yoğunlu nîşanî wan didin. Lê Yoğunlu tiştekî qebûl nake û dibêje: "Ne min telefonî buroyê kiriye, min tiştekî wilo nekiriye, jixwe ez Nazim Babaoğlu jî nas nakim." Li ser gotinên Yoğunlu, Bayram Balci dibêje ku, "Vî mirovî berî du-sê mehan dixwest ku li Siwêrekê rojnameya me bi desta belav bike, ku nebû qismet niha jî her tiştî înkar dike, derewan dike."



*Nazim Babaoğlu*

Pişt re Alîkarê Berpirsiyarê Giştî yê Rojnameya Özgür Gündemê F. Ferda Çetîn û Berpirsiyarê Karê Îdarî Zülküf Kişanak ji bo vê bûyerê çûn Ruhayê. Çetîn û Kişanak bi Waliyê Bajêr Ziyaedîn Akulut re hevdîtinek pêk anîn, di hevdîtinê de, ji Waliyê Bajêr xwestin ku di wexteke kin de Nazim Babaoğlu bê dîtin.

Dû re ji bo dîtina Babaoğlu, Gündem'vanan bi daxwaznameyekê ev yek ji Dozgeriya Komarê ya Bajarê Ruhayê jî xwestin. Heta rojnameya me kete çapê jî ji aqûbeta wî agahî tune bû.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Bi hatina Newrozê re

Bihara vê salê weke sehneyeke şanoyê ye (tiyatro). Senaryoya ku berî 20 salan hatibû nivîsandin, ber bi dawiya xwe ve diçe. Heke neqede jî, wê encama qedandinê xuya bibe.

Leyîstikvan perdeya herî pêwist dileyizin.

Ji aliyekî sehneyê ve jineke mest, bêçar, melûl û têkçûyî derdikeve pêşiya temaşevanan. Bi destekî hêstirên xwe paqij dike, bi destê din jî kumekî leşkerekî kuştî radike û dibêje: "Ya bîtecekler, ya bîtecekler..." û serçok dibe.

Ji aliyê din ve, mêrekî xurt, zendbadayî, serbilind û bixwebawer, derbasî sehneyê dibe. Berê xwe dide temaşevanan û bilind bang dike: "Yan serkeftin, yan serkeftin!.." Gelê temaşevan bi yek car radibin ser piyan û lê vedigerînin: "Yan serkeftin, yan serkeftin!.."

Jina piştşikestî hewl dide xwe bireve. Li deriyekî digere, nabîne, digirî...

Belê, weke perdeyekê ye. Di navbera herdu aliyan de diyaloga bîst salan êdî ber bi encamê ve diçe.

Dîrokê bihar ji Kurdan re nivîsandiye. Di biharê de Kurdan azadî dîtine, di roja nû (21'ê Adarê–Newroz) de pîroz kirine.

***Gul vedibin, roj derdikeve. Dîrok xwe nû dike û her kes matmayî dimîne; Kurd azad dibîne! Rojnameyên hikûmetê di seferberiyê de ne. Hürriyet, Milliyet, Türkiye û Kanalên Show, Star, TRT... li kar in. Rojekê Abdullah Öcalan dikujin, rojekê direvînin, rojekê winda dikin, rojekê dişînin Yewnanîstanê, Ermenîstanê... û roja din jî C. Bayik jê diqetînin... Fiyasko! Ev ne cara yekemîn e, ne jî cara dawiyê ye. Ew Öcalan dikujin, roja din jî ji nava gel derdikeve.***

Em di bihare de ne. Hikûmet li benda çi ye? Berê, wan jî digotin bihar, xwe di biharê de didîtin, lê di van bîst salên derbas bûne de, rojeke tenê jî, ji biharê nebû ya wan.

Bihara vê salê ne weke biharên tu salan e. Di vê biharê de ferhenga şoreşa me hinek gotinên nû hildigire. Ansîklopediya şoreşê êdî wîşeyên weke "Hikûmeta Şer, Meclîsa Neteweyî, Herêmên Rizgarkirî.. û hwd." şîrove dike.

Berê, wan êrîş dikirin, Kurdan xwe diparast. Niha rewş bi awayekî din e; Kurd êrîş dikin ew xwe diparêzin. Tenê riyek li pêşiya wan maye, riya revê, ya Demîrel û Înönü.

Em di biharê de ne. Ew hewl didin xwe ku bihara me bişewitînin, em jî, ji bo xemilandina wê bi hemû derfetan xwe amade dikine. Lewre bihar ji herdu aliyan re jî çarenûsa jiyan û mirinê ye. Gel, pişta xwe daye gerîla, gerîla ji Newrozê re gurzek gul amade kiriye. Êdî ne tenê Kurdistan, şer berê xwe dide bajarên Tirkan jî, hikûmet neçar e, poşman bibe û gava xwe bi paş ve biaêje.

Şer... Ha şer!

Gul vedibin, roj derdikeve. Dîrok xwe nû dike û her kes matmayî dimîne; Kurd azad dibîne!

Rojnameyên hikûmetê di seferberiyê de ne. Hürriyet, Milliyet, Türkiye... û Kanalên Show, Star, TRT... li kar in. Rojekê Abdullah Öcalan dikujin, rojekê direvînin, rojekê winda dikin, rojekê dişînin Yewnanîstanê, Ermenîstanê... û roja din jî C. Bayik jê diqetînin... Fiyasko!

Ev ne cara yekemîn e, ne jî cara dawiyê ye. Ew Öcalan dikujin, roja din jî, ji nava gel derdikeve.

Fiyasko!

Dewlet her tiştî winda dike. Çareyê di revê de dibîne, nikare bireve jî.

Û em di biharê de ne! Heke wan qedandina me ji rizgarkirina xwe re kiribin hedef, em jî, ji riya serkeftinê bêhtir tu riyên din nabînin.

Bi ruhê "yan serkeftin, yan serkeftin" em dibin xwediyên biharê.

Tenê em bi serkeftinê dikarin xwe di nava mirinê de jiyan bikin.

## Ji çapemeniya biyanî

### *Peywendî nawan Iraq û Fransa*

Serçaweyekî berzî Fransî aşkirey kird ke, Fransa peyrewî siyasetêkî niwê dekat, bo asayî kirdinewey peywendiyekanî le gel Iraq da, belam be şêweyekî le ser xo. Heman serçawe witî: Ke Fransa bem zuwane nûsingeyekî bazirganî le Baxdad dekatewe û, danûsanî harîkarî kirdinî petrolîş debate astêkî beriztir. Bem zuwaneş wefdêkî Irakî be serokayetî Taha Humud degate Parîs bo ziyatir baskirdinî harîkarî petrolî le nêwan herdû welat da.

Çawdêre Fransiyekan delên ke fransa em hengawe le ser ew binaxeye denêt ke guwaye le gel kotayî salî 1994 da hendêk le abloqey abûrî ser Iraq kem dekrêtewe.

### *Egerî ruxan dinî Seddam*

Serçawekîn oposisionî Irqî rayangeyand ke, damudezgakanî asayîşî Iraq destî kirdiwe be reşbigîriyekî berfirawan le rîzekanî sûpay Iraq da û betaybetîş le rîzekanî efser û, derecedaran da emeş diway ewe dêt ke, desteyek le efseranî sûpay Iraq ke le naw rîzekanî sûpa da kar deken, beyannameyekiyan derkirdiwe û tiyay da belîniyan dawe ke, diwayî be hukmî Seddam bihênin û deselat bidenewe dest gel, her weha em desteye belêniyan dawe kewa diway ruxandinî Seddam mawey 6 mang hukûm biken û paşan helbijardin çêbiken. Em desteye yekem beyannamey le yadî (73) saley damezrandinî sûpay Iraq da belaw kirdewe.

**Rojnamey Asharq Alawsat**

### *Çekî Rûsiya bo Tirkiye*

Biriyar waye ke Tirkiye behay 150 miliyon dolar çek le Rûsiya bikrêt bo bekarhênanî dijî şorişgêranî Kurdistanî bakur. Tirkiye û Rûsiya bem boneyewe peymanêkiyan morkirdwe û be pêy em peymane Tirkiye 19 helîkopter û 200 tank le Rûsiya dekrêt, herweha le kotayî salî 1993 da dîsanewe Tirkiye behay 75 miliyon dolar çekî le Rûsiya kirrî û be heman şêwe dijî Kurdekanî Kurdistanî bakur bekarî hênawe.

**Kovarî Al Watan Al Arabî**

### *Dû teqînewe le Tirkiye*

Ajansî deng û basî Anadol raygeyand ke 6 serbaz û 11 hewulatî le dû teqînewey ciyawaz da le xwaruy Tirkiye birîndar bûn. yekêk le bombakan le kîseyekî naylon da le ber dergay postey Adana danrabû û ziyanêkî gewrey geyanduwe. Bombakey tirîş le nawendî çayxaneyekî şarî Mersîn da teqiyewe.

Hêzekanî asayş çend kesêkî guman lêkrawiyan destgir kirdwe û kesîş berpirsiyarêtî xoy le teqinewekan ranegeyanduwe.

**Rojnamey Asharq Alawsat**

# Tirkiye: Şampiyonê kuştina rojnamevanan

**Nûçeyên Derve–** Li gorî rapora Komîteya Hêvişandina Rojnamevanan (CPJ) sala çûyî 56 rojnamevan li ser karên xwe hatine kuştin. Di raporê de Tirkiye ji aliyê kuştina rojnamevanan ve di rêza 6'an de cih distîne. Bosna–Hersek, bi kuştina rojnamevanan, Cezayîr bi 11, Tacîkîstan bi 11 kesan ve di rêzên pêşîn de ne. Li Rûsyayê jî 8 kes li ser karên xwe hatine kuştin.

Komîteya Hêvişandina (muhafezekirina) Rojnamevanan (CPJ) ku navenda wê li New Yorkê ye, rapora xwe ya 1993'yan weşand. Li gorî vê raporê sala çûyî pest, sansor, qedexeyiyên li ser çapemeniyê û kuştina rojnamevanan domiyaye û 56 rojnamevan li ser peywira xwe ji canê xwe bûne. Tirkiye di raporê de bi kuştina 4 rojnamevanan di rêza 6'an de cih digire. Tê daxuyandin ku di 1992'yan de jî 9 rojnamevan li Tirkiyeyê hatine kuştin û tevî her çareyên dawî kujyarê yekî jî nehatiye dîtin.

Rapor cih dide pesta dewleta Tirk a li ser çapemeniya sosyalîst û dijber jî û diyar dike ku 246 doz li hemberî Özgür Gündemê vebûne û ji aliyê DED'ê (DGM) ve darizandin hatine kirin.

Ji aliyê din ve dadixuyîne ku li gorî salên berê weşanên cihêrengtir derdikevin, lê dewlet jî bi azîneyên (metodên) din ji bo bêdeng û kerkirina wan dikêfire. Her wiha li ser helwesta PKK'ê ya li dijî çapemeniya Tirk jî radiweste.



Ferhat Tepe



Aysel Malkaç

# SPD ji bo Kurdan alîgirê federasyonê ye

**Nûçeyên Derve–** Partiya Sosyal Demokrat a Alman (SPD) prensîbên xwe yên siyasî yên li ser rewşa gelê Kurd ji nû ve peyitandin (tesbît kirin). Di nav prensîbên polîtîk de ku ji aliyê Fraksiyona Parlementoyê ve hatiye pejirandin, der barê gelşa Kurdî de polîtîkaya SPD'ê ya himî wiha tê diyarkirin: "SPD di çarçoveya îdareyên herêmî yên serbixwe û federalî de pişgirî dide mafê tayînkirina çarenûsiya gelê Kurd. SPD wê desteka ku hewce bike bide rêxistinên Kurd ên ku bi vî awayî têdikoşîn."

Di nav rapora SPD'ê ya Koma Xebatê ya li ser Kurdistanê de tê gotin ku ji hezar salî zêdetir e Kurd li ser wê axê dijîn û bi peymana Lozanê ya 1923'an mafên Kurdan ji destê wan hatine standin û dewletên neteweyî yên ku piştî peymanê derketine rastê mafê tayînkirina çarenûsiyê nedaye Kurdan.

SPD di nav prensîbên xwe de dide zanîn ku destek dide rêxistinên Kurd ên ku dixwazin di nav sînorên heyî de bêyî şidetê mafê federalî û otonomiyê bê dayîn

Partiya Sosyal Demokrat a Alman di dawiya rapora xwe de radigihîne ku wê piştgiriyê bidine hemû rêxistinên Kurd ên li gorî qanûnên Alman li Almanyayê tevdigerin û alîgir e ji wan re ku mafê xwe yê rêxistinê ji dewleta Alman bistînin.

# Dewleta Alman navên Kurdî qedexe dike

Helwesta Komara Almanyaya Yekbûyî li hemberî doza gelê Kurdistanê gihîştiye qonaxeke wiha ku, ev dewlet qanûna xwe, qanûna navneteweyî û kêmtirîn mafên mirovan binpê dike.

Em şaş û matmayî namînin, dema ku Komara Tirk (KT) li hember Tevgêra Rizgariya Neteweyî ya gelê Kurd, li dijî zagonên (qanûnên) xwe û li dijî mafên mirovan dilive. Ev liva wê, ji xwezayiya wê tê. Tu caran vê komarê li dadiyê û mafdariyê nepirsiye. Ji bo ku mêtingerî û dagirkeriya xwe li ser piyan bihêle, her tişt binpê kiriye. Gelo Almanya, bi çi bîrsayî (mentiqî) vê helwestê digire? Çima mîna Komara Tirk nêzî doza gelê Kurd dibe?

Em van pirsan li hêviya nirxandina xwendevanan dihêlin û çend helwest û bûyeran berbiçav dikin.

Bi dehan Kurdên ku li doza gelê xwe xwedî derdikevin di zindanên Almanî de radizin. Van kesan tu guneh li dijî zagona Almanî nekirine. Tu sedemên zagonî jî, ji bo girtina wan nîn in. Lê eger em kûr li vê pirsê bikolin emê bibînin ku dirêjahiya zagonên Tirkî xwe diavêje ser serî û guhên penaberên Kurdên li Almanyayê. Li Almanyayê ji zagona Tirkiyeyê li ser gelê Kurd bi rê ve diçe. Nimûneya herî berbiçav girtiyên Zîndana Dusseldorfê ku li ser gunehên (!) ku li Rojhilata Navîn hatine kirin, tên darizandin. Bi awayekî din em bibêjin, di kesayetiya wan de gelê Kurdistanê tê darizandin, şoreşa Kurdistanê tê darizandin.

Jixwe em li vir pirsa alîkariya aborî û leşkerî ya ku Almanya dide KT'ê, gund û çiya û daristanên ku bi çekên Almanî tên şewitandin, mirovên ku bi van çekan tên kuştin tev li cihekî dihêlin.

Mîna ku em dizanin, helwesta Almanyayê ya dawî; qedexekirina PKK û ERNK û hemû saziyên Kurdan li Almanyayê gava herî mezin bû, ji hêla wê ve ber bi tevlîbûna şerê qirêjî yê ku li dijî gelê Kurdistanê dimeşe. Almanya li tewreke eşkere, êdî bû aliyek di vî şerî de. Bêhna wê bi alîkariya aborî û leşkerî fireh nedibû. Xwe jî mîna aliyekî şer danezan kir. Ev sazî û komeleyên ku li gorî zagonên Almanî hatine avakirin. Bi girtin û qedexekirina wan zagonan xwe binpêkirin. Di şûna zagonên Almanî de, bi awayekî ku (li tu deverê cihanê nebûyî)ve zagonên Tirkî bikaranîn.

Em van tevan berdin. Ev du sal in dest avêtine helwesteke balkêş û pêkenok. Bi rastî ne pêkenok e; şermeke mirovahiyê ye. Êdî ji sînorê maf û zagonê jî derbas dibe. Lê dîsa jî mirov pê dikene. Gotineke Ereban heye: "Bela giran mirov dikenîne." Em vegerin ser afirîndera demokratiya hemdem. Balyozxaneya Tirkan lîsteyek navên Kurdî yên qedexekirî ji bo cihê qeyd kirina zarokên nû ji dê dibin, şandiye. Ev cih jî saziyeke Almanî ya ku tu têkiliyên wê bi zagona Tirkî re nîn e. Li gorî vê lîsteyê qedexe ye kıı Kurd zarokên xwe bi van navên Kurdî bi nav bikin. Ji bo têgihîştinê em dixwazin vê nimûneyê bidin:

Kurdek diçe cem karbidestê Almanî, dibêje: "Navê zarokê min Mezlûm e."

Karbidest lîsteya Tirkan derdixe û dixwîne: "Ev nav Kurdî ye û qedexe ye." Yê Kurd dibêje: "Qedexe medeqe nizanim, kurê min e û min nav lê kiriye. Ez li Almanyayê me, ne li Tirkiyê."

Karbidest: "Li Almanyayê jî qedexe ye"

Belê li Almanyayê jî qedexe ye lê bi çi mafî û li gorî kîjan zagonê? Mirov gelek caran dikeve dudiliyê û van pirsan dike: Gelo ev karbidest Alman e yan Tirk e? Ev polîs Alman e yan Tirk e?

Êdî ew sînor hatine çirandin. Aliyên şer eşkere bûne. Li hêlekê gelê Kurdistanê û li hêla din jî Komara Tirk û hevalbendên wê. Şerê qirêjî yê ku li dijî gelê Kurdistanê dimeşe piralî ye.

Maf, zagon û zor mîna benê lorê tevî hev û bi hev bendekirî ne. Ji bo berjewendî û sûdên xwe mêtingerî dikare her tiştî bike. Mêtingerî û mijokdarî li ku derê dibe bila bibe yek e. Emê herdu pirsên destpêkê ji bo nirxandina xwendevanan bihêlin û vê nivîsarê bi gotineke kalê Zerdeşt ve dawî bikin:

"Miletê ku zagona xwe ya serbixwe li gorî xwe, dîtin, bîr û baweriyên xwe nenivîse û bi rê ve nebe, jiyan ji bo wî miletî nîn e."

**Selîm Biçûk**

## *Li Stenbolê 'Platforma Demokrasiyê'*

Li Stenbolê, ji hêla rêxistinên pîşengî (meslekî) û girseyî ve Platforma Demokrasiyê tê çêkirin. Piştî Enqere û Îzmîrê nêzîkî 30 rêxistin ku di nav wan de wek Komeleya Mafên Mirovan (KMM), DÎSK (Konfederasyona Sendîkayên Karkerên Şoreşger), Sendîkayên Xebatkarên Dewletê, TMMOB (Serokatiya Odeyên Muhendîs û Mîmaran a Tirkiyeyê) şaxên wan ên Stenbolê hene metneke hevpar pejirandin û biryarê avakirina platformê standin.
Di teksta platformê de li ser meseleya Kurd, ekononî, bêkarî, qanûnên dij–demokratîk, pirsgirêkên tevgera karkeran, bêsendîkakirina xebatkarên dewletê, neteweperestî û hwd. tê rawestandin û tê daxuyandin ku ji têkoşînkirinê pê ve tu rê nemaye.

## *Dewlet êrîşî ser malbatên dîlan kir*

Lêzimên girtiyan li ber derên girtîgehan rojên cejnê jî lêdan ji hêzên dewletê xwarin û tehda li wan hate kirin û bi ser de jî, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin. Dîlên ku di girtîgehên Amed, Mêrdîn û Mûşê de ne, ji bo protestokirina hildana muafiyeta mebûsên DEP'ê û binçavkirina wan, dest birçîbûnê kirin. Malbatên ku bi mebesta hevdîtina eqrebeyên xwe çûbûn girtîgeha Erzirom û Batmanê ji aliyê leşkeran ve hatin hingaftin û tehde li wan hate kirin. Li Batmanê li ser lêdan xwarina pîrekeke 60 salî ji hêla leşkerê nobedar ve pevçûn çêbû. Ziyaretvan û hêzên dewletê bi nav hev ketin. Gel bi keviran êrîşî ser wan kir. Li Erziromê jî malbatên ku di 15'ê mehê de ji bo ziyareta girtiyan hatibûn û ji ber nedana îizna hevdîtinê dest bi livbaziya rûniştinê kiribûn, hate hînbûn ku hêzên dewletê bi jopan cerdî ser wan kirine û hin kes ji wan birîndar kirine. Ji aliyê din ve hate ragihandin ku 5 kesên ji Girtîgeha Erziromê vedigeriyan li Çepekçûrê (Bîngolê) hatine girtin.
Navê kesên girtî ev in:
Xidir Şahîn, Sînan Güler, Hüseyîn Güler û Alî Ekber û birayê wî Cemal.


## *Li ser bûyera Tuzlayê 21 kes hatin girtin*

Ji 40 kesên ku li ser bûyera Tuzlayê hatibûn binçavkirin, 21 kes hatin girtin. Bersûcên ji bûyera Tuzlayê, piştî binçaviya wan î li Emniyeta Stenbolê, Şaxa Têkoşîna bi Terorê re, roja 16 û 17'ê Adarê sewqî DED (DGM)'ê bûn. Roja pêşîn 15, dotira rojê jî 4 kes hatin berdan. 21 kesên ku li ser bûyera Tuzlayê hatibûn binçavkirin, ji kuştina 5 serbazên yêdek û birîndarkirina 36 kesan berpirsiyar tên girtin û tê îdîakirin ku alîkarî, xwarin û antaxiya PKK'ê kirine. Ew kesên ku hatine girtin navên wan ev in: "Şerîf Mercan, Cumalî Karasu, Hediye Aybek, Medîne Çaliş, Sakîne Fîdan, Ercan Çelîk, Kazim Ergün, Musa Ünlü, Mehmet Güzel, Fuat Yilmaz, A.Rahman Çoşkun, Tülîn Dağ, Saît Yüreklî, Hasan Karakuş, Beytullah Gamsiz, A. Azîz Andaç, Kutbettîn Taşkiran, Selahattîn Yamalak, Bakî Bozdemîr, Ahmet Yerkar û Yüksel Akova.

# Juppe dîalog xwest

**Navenda Nûçeyan–** Wezîrê Karê Derveyî yê Fransayê, di ziyareta xwe ya Tirkiyeyê de endîşeya xwe li ser hildana muafiyet û girtina mebûsên DEP'ê anî zimên. Alaîn Juppê, Wezîrê Karê Derveyî yê Fransayê, der barê gelşa Kurdî de jî gote ku pêwist e ev "lihevxistin" bi riya dîyalogê hel bibe.

Alaîn Juppê ku di 16'ê mehê de li ser daweta Hîkmet Çetîn, Wezîrê Karê Derveyî yê Tirkiyeyê hate Enqerê, pêşî bi Çetîn re, dû re bi Serokwezîr Tansu Çîller re hevdîtin pêk anî. Juppê daxuyand ku Çîller der mafê mebûsên DEP'van de agahî dayê. Wezîrê Fransiz piştî pêwendiya xwe ya bi Tansu Çîller re derbasî Wezîriya Karê Derveyî ya Tirkiyeyê bû û bi rayedarên Tirk re têkilî danî. Hîkmet Çetîn di pey civînê de ragihand ku Fransa bi Tirkiyeyê re ye û di meseleya PKK'ê de pîştevan e. Alaîn Juppê jî diyar kir ku li dijî PKK'ê ne û pêwist e gelşa Kurdî bi riyên xweşkahî û dîalogê bê çareserkirin.



Alaîn Juppe

# NÇM şaxeke xwe li Îzmîrê jî vekir

**Navenda Nûçeyan–** Navenda Çanda Mezopotamyayê li Îzmîrê ji şaxeke xwe di 19'ê Adarê de vekir. NÇM' a ku navenda wê li Stanbolê ye û li ser çand, dîrok, huner, muzîk, folklor û hwd. ên Kurdî xebatên xwe didomîne berê jî li Amed, Hewlêr û Edenê liqên (şaxên) xwe vekiribû.

Gerînendeyê (mudurê) Şaxa NÇM'a Îzmîrî M. Alî Aksu sebebê vekirina saziyê bi hebûna Kurdan a li Îzmîê ve girê da û daxuyand ku ji bo pêwistiyên wan pêdivî bi vekirina şaxê dîtine. Her wiha Aksu da zanîn ku wê di serê pêşîn de dest bi xebatên li ser folklor, muzîk, tîyatro û wênesaziyê (resm) bikin.

Ji hêla din ve M. Alî Aksu ragihand ku potansiyeleke mezin Kurd li Îzmîrê dijîn û di nav wan de kesên zanyar wek zîmanzan Kaya Muştakhan, dîrokzan Cemşîd Bender û lêkolîner Ahmet Aras jî hene ku di nav xebatên NÇM'ê şaxa Îzmîrê de navên wan dibihure.

*Li hember mebûsên DEP'ê lîstika dewletê didome:*

# DEP'van avêtin zîndanê

**Zana Farqînî**

Pênc parlementerên DEP'ê Serokê Giştî Hatîp Dîcle, Leyla Zana, Ahmet Türk, Orhan Doğan, Sirri Sakik û parlementerê Şirnexê yê serbixwe Mahmut Alinak, bi daxwaza Serdozgerê DED'a Enqerê Nusret Demîral hatin girtin. Parlementer bi "îxaneta bi welêt re" tên sûcdarkirin û li gorî xala 125'an a Qanûnê Bingehîn îdama wan tê xwestin.

Di nav parlementeran de, hate ragihandin ku Serokê Giştî yê DEP'ê Hatîp Dîcle bi tenê ne di binçaviyê de û ne jî li DED'ê îfade daye. Her şeş mebûs jî şandin Girtîgeha Enqerê.

Parêzerên (ebûqatên) DEP'ê daxuyandin ku, hem awayê hildana muafiyeta mebûsan û girtina wan, hem jî şêweya darizandin û pirsiyariyê ji qanûn der in û wek skandaleke hiqûqî nirxandin. Ji aliyê din ve li ser biryara Nusret Demîral nehiştin ku parêzerek jî beşdarî pirsiyariyê bibe.


Çi girtina mebûsên Kurd û çi jî şandina leşkeran tevî kereseyên (malzemeyên) wan î Kurdistanê, wek operasyona dewletê ya li hemberî kozik û sîperên Kurd ên legal hate şîrovekirin. Dewlet 150 hezar leşkerên din jî xeynî tîmên taymetî şandin Kurdistanê, bi hinceta ewlehiya hilbijartinên cîgehî (mihelî) û pîrozbahiyên Newrozê.



Mebûsên DEP'ê dema ku ji Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê derdikevin.

Li ser rewşa dewletê û kirin û şêla wê ya der barê meseleya Kurd û mebûsên Kurd tê axaftin ku, ji ber tengî û nezanîbûnê komara Tirk nizane çi bike. Biryarên Konferansa Bakurê Kurdistanê û mesaja Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan kir ku, di warê dîplomatîk û siyasî de dor li komara Tirk teng bibe. Nêziknebûna rayedarên Tirk ji çareserkirina gelşa Kurdî û bêdengmayîna wan î li pêşberî biryaran, ev nirxandin zexim dike.

Erîşên dewletê di çaxên wiha cihêreng de nolî kêferatên dengbirinê û reva ji çareyê tê nirxandin û ji hêla din ve tê gotin ku bi serveçûna dewletê ya bi ser gel û nûnerên wan ve tu ziyanê nadê tevgera azadiyê. Tê ragihandin ku tevger ne bi tenê di warê dîplomasî û siyasiyê de her wiha di yên leşkerî, aborî, çandî, îdeolojî û hwd. de têdikoşe. Qewmînên dawî, rewşa cîhanê û hewaya li Ewrûpayê ji bo Tirkiyeyê ne ji xêrê re, lê ji bo tevgera azadî û serxwebûnê bi başî tê nirxandin.



# Newroza 95'î

**L. Jandîl**

Çimê ma roştî bê! Çiller "Newroz"a Tirkan kena roşana remiye. Heke dewleta Tirkî newroze piraoz kero tablowo cêrên vejîno werte:

Tewr virêndiyêde Güreş dê ra dime Demîrel Çîlere, dine ra dime; Yekta Güngör, Demîral, Waliyê Waxtî Erkan û Ağarî; dînan ra jî dime wezîrê zerî Menteşe, yê Edaletî Oktay û yê teberî Hîkê Lice û M. Nurî Yilmaz; kaleka nînan de jî Timisiyo elewî, Xoco bisilman, Türkeşo verg û yê bînî...

Peyniye de tayê Kurdê feqîrî, Lazî, Çerkezî û Erebî; Serokê dîn û mesheba pêrîne kam biyê, wazenê gor şan û şerefê dewlete "Newroz"e pîrozkerê Güreş Paşa şan û şûrtanê xo, qehremaniyake yê û leşkeranê dê demê pîrozkerdena "Newroz" e de musnê; Demîrel û Çîlere se biyê layikê "Newroz"e; se biyê layiqê dayê û Atatürk î; Dînan ra dime Demîral, ceza ke da mordemê ke "Newroz"e dişmenetiya Tirka û Kurdan kenê; Waliyê Waxtî, guretena kesanê ke, "Newroz"e de serê kowan ra adir ta nêfîşto; Ağar "parlamento"ra veten û binêçima guretena wekilanê Kurdanê ke %70 rayî guretbî, "Newroz"e pîroz nêkenê; Wezîrê zerî Menteşe ebi can û zere, cira çiqa ke êno qereno, dîroka "Newroz"e ano ziwan û vano: Esas "Newroz"e yê ma na. Di hîrê teroristîvejiyê wazenê "Newroz"a ma ma dest ra bicêrê, la belê no kef qirika dinan de maneno. Ma "Newroz"a xo, "Newroz"a şaranê Tirkan nidame terorista.

Wezîrê edeletî, edeletê Elî keno vila, teba Timisî qerêno û vano; "Newroz"e rojbiyena Elî ya, roja xêr û xismetana, kal û belayra nat ma na roja xêrê pîroz keme".

Wezîrê teberî Hîkê "Lîce" der heqê girsiya dewleta Tirkî û şaranê Tirkî de qese keno û vano; "Ma serba pîrozkerdena "Newroz"a şaranê Tirkan naca bîme kom. Niyade dewlete çiqa girs û comerd a, ke verdena Kurdî jî bêrê ma de "Newroz"a ma pîrozkerê."

M. Nurî venga heqî dano, teba Xocê duzenê adilî dua keno, berbeno, zîbeno, sond weno ke, "Newroz"e yê şaranê bisilmana û sere de jî yê şaranê Tirkan a.

Türkeşo verg, ebi eşq û îmanêde girsî, dîroka "Newroze" û verganê Ergenekonî sero, vergî se kowan sero, dormê adirê "Newroze" de çerx dênê xo û zurênê, vindeno.

Medya Tirkana mehmetçîke, –Rojnamê Televizyonî, Rodonî ha yê dewlete, ha yê kesan– ebi sernivisanê zaf girsan, der heqê qedr û qimetê "Newroze" de nivisnenê. E. Çölaşan ebi nivisa xo, xo, medya xo û yê bîna pêrîne zurêker vejeno. Çölaşan, Qehremano tewr girs! kilaberê namusî! ebi xo vano: "Wulle ke ez jî cahale biya. Ti nêvana Newroze "Kurtçiyanê" ma biya xebara ma cira çênêbiya. Her sere 21 Adarê de, naroşane roşana kenê sebeb çiya vecenê." û dima jî perseno. "Rind hama çikebiye na "Newruze?" Qe merex mekerê, çimê ma roştî bê. Se ke şima jî zanê "Newroze" kerda malê Tirkanê Asya Wertêne. Bê guan qe fam nêkerdo, ke biperso, yan jî nêwaşto; demê Osmaniyan ra hetanî ewro qe, hama qe roje Tirkan "Newroze" pîroz nêkerda, ma se bêşerm meyşte na roşna pîroz keme. Senê rû yo, senê heya wo?

Heya meya caverdê, mevacê nêbeno, bawar bikerê beno. Ne şanê nînan, nê şodirê nînan; nê çepê nînan, ne raştê nînan; nê rinda nînan, ne jî xirabiya nînan nêna zanayene. Tirkiye de her çî beno.

Naca de perse na wa:

Waxto ke Newroze de niyanêne bêro pîrozkerdene, ma se keme? Ma kotiyê na Newroze de ca cême?

Pîraozkerdena na roşna de cayê ma kaleka zaliman de, kaleka gonîweran de, kaleka mixenet û xorotan de esto yan jî çîno?

Bê guman û bê fikiriyene çîno! Nayrê jî ez nikara vanane "Newruza vegan û cinawuran bê ma pîroz bo!"

## JI RAYA GIŞTÎ RE

*Wek tê zanîn ji berê ve ye ku bi giştî polîtîkayên qirkirinê li ser gelê me tênê ceribandin û di van demên dawî de jî di şexsê mebûsên partiya me (DEP) de mafê nûneriyê ji destê gelê me bi zorê tê standin.*

*Li hemberî van polîtîkayên dij-mirovî, hûn mebûsên herêmê bêdeng dimînin. Ev jî nîşan dide ku li hember kesên ku hûn bi rayên wan çûne Meclîsê dikevin rewşa îxanetê. Ji ber vê yekê hûnê wek mirovên rûreş di dîrokê de navê xwe bidin nivîsandin. Ji ber vê tewra we em bi kîn û nefret we protesto dikin.*

*A. Ekber Uğuz, Alî Bîngöl, Gülser Mollaoğlu, Mehmet Özdemîr, Yaşar Yarar, Hayrettîn Gültekîn, Îsmet Çelîkkeser, Adem Özaydin, Nurettîn Çirak, Abbas Yardimci, Şahîn Gültekîn, Süleyman Gültekîn, Mehmet Gültekîn, Abdülrezzak Çelîk, Mehmet Erdem, Nurettîn Aydoğan, Veysel Temel, Mustafa Ünlü, Cahît Kolçak, Zülfü Kolçak, M. Alî Köylü, Hakki Kolçak, M. Alî Kolçak, A. Azîz Çîçekçî, Mehmet Parmak, Mehmet Okçuoğlu, Hüseyîn Oğuz, Mecît Okçuoğlu, Sabrî Ünlü, Mehmet Çîçekçî, Îsmaîl Vargün, Bertal Yildiz, Düzgün Küçükbaş, Alî Kaçar, Tacîm Ayvadaş, Kemal Çakar, Aydin Kaya, Riza Yalniz, Gülalî Kaçar, Alî Gök, Kamer Şahîn, Naîl Turak, Aslan Yüce, Bedîr Vargün, Kemal Songül, Îsmet Baysu, Yusuf Erîn, Menal Avci, Mehmet Çîçekçî Mehmet Alî Güneşlî, Denîz Akdenîş, Ramazan Baştaş, Mehmet Akyol, Agît Akyol, Şehmuz Suliktekîn, Yusuf Aksoy, Çetîn Duruşkan, Mustafa Aksoy, Abbas Çelîk, Abdî Ceylan, Vahît Poyraz, Cabbar Kizilkaya, Welat Vurgun, Mehmet Ceylan, Reşît Esen, M. Şîrîn Güneş, Abdülcabbar Öndaş, Alî Bulut, Yusuf Saboş, Hasan Uygur, Ahmet Demîrcan, Tevfîk Dağ, Nazmî Demîrcan, Seyfettîn Özgür, Ateş Kanat, Hüsnü Esen, Bekîr Akyol, Serhan Bulut, Azîz Ural, Süleyman Ökmen, Şerîf Aydoğan, Şehmuz Çelîk, Hasan Hayrî Alkan, Mehmet Akar, Mehmet Erdem,*

***Rêxistina DEP'a Kadiköyê/Stenbol***

## Nektik



*Hunermendekî jidil (rasteqîn) rêzîkên ji berê ve hatine tesbîtkirin, naşopîne.*

**Gomrich**

## KÊ ÇI PEKAND?

**Wê îsal 7 milyon û 500 hezar tûrîst werin Tirkiyeyê.**

*Abdulkadîr Ateş*
*(Wezîrê Tûrîzmê yê Tirkiyeyê)*

# Kurdîzan yek gav pêêêş!



Ev heftê sal e ku Kurd diçin leşkeriyê û li leşkerî tim ji Kurdên gundî, cahil, nexwende û yên Tirkînezan re zor û dijwar bûye. Di dema leşkeriya xwe de suxre kirine û kêm zêde çend gotin bi Tirkî fêr dibûn, dema dihatin mala xwe bi suxre û van gotinên xwe yên li leşkeriyê fêr bûne dipesinin. Serpêhatiyên leşkeriyê çawa ku doh qewimîbûn û wek fîlmekî ji serî ta binê dihat bîra wan. 3–4 sal bi bêhnek dikaribûn bigotana.

Dema yek ji leşkeriyê dihat, dora mijûliyê êdî nedidan leşkerê nû û wey li wî ku kada leşkeriya xwe bikira. Bûyer û serpêhatiyên xwe yên leşkeriyê li civatê digotin. Yekî ji wan li civatê dîsa dest bi çîroka xwe kir. Belê, "Em rojek li talîmê bûn "Bölük Qomûtanê" (Serbazê me) me hate ba me û ji me re nûtix da: "Dûjmen oyladir û boyladir" (dijmin wa ye wiha ye) Bi vî awayî behsa muxarebe meydanî kir, tiştek nema ku wî bêbavî negot. Min berê xwe da hemşeriyê xwe yê Belîsî. Ebrahîm! Bavo te tiştek fêm kir?

– Na, ez bi Xwedê kim min tu tişt fêm nekir, got

Wele niha dê qîmîtan were û ji me bipirse ka emê çawa bikin... Wele halê me xerab e birako, ewê dîsa li me bixe û di ser re jî wê çawîş li me bixe. Hêj gotina min di devê min de, tewfîqa Xwedê Bölük Qomîtanî hate ber min sekinî û destê xwe da tifinga min. Heta ji min hat bi dengekî bilind min kuniya xwe xwend. "1.cî ordû, 2.cî kolordû, Topçû we Fuza oqilî, destek ktl,......... Bölüğî, M.S.Siliman, Şerefeddîn oxlî, 1946 Erzerom amrêt qîmanderim!" min got. Ji min pirsî got, "Bu nedir?" (ev çi ye?) "9, mm çapinda, uzun mezinlî, gazin gerî depmesiyle çalişan, yarî otematîx (otomatîk) qirqele tifingdir" min got. Inca destê xwe danî ser qontaxa tivinga min û got ev çi ye. Min got qîndaxdir qîmander. Wî ji min re got: "Ûlan buna kotak desene êşek oxlû êşek" (kerê kurê kerê bibêje kotak) Wele qîndax qîndaxdir qîmander, min got. Evî bêbavî pehînek li binê çoka min li hestiyê birçî xist . Êêê, min got qey piyê min bû xertek. Kurê bêbava çiq?s bi qewet bû! Hêstirên ziwa ji çavên min xingirîn xwarê. Ez newêribûm bigiriyama jî. Berê xwe da çawîş û got "Çawîş! Bu adema Tirca orat" ( Çawîş vî zilamî fêrê Tirkî bike). Û bi Xwedê çawîşê me jî ez şandim "Elîoqilê" Wele em li "Elîoqilê" rehet bûn lê, lêdan zehf bû kurên bêbavan dişelpandine me wek ku li gawiran bidin, agirê minceniq ji ber çavên me diçû. Hema ji me re digotin "sitir ûlan kiro" ah ez nizanim ev çi bû, çima ji me re digotin...

Ev gotinên han hin tişt anîbûn bîra leşkerê nû û wî jî dest bi meseleya leşkeriya xwe kir.

Wele, yekî Bîngolî jî li ba me hebû wî rebenî "Tirkî nizanibû, nizanibû tekmîl bida, nizanibû kunya xwe bixwenda, levzek Tirkî nizanibû, pa nizanibû navê xwe jî bigota?" Teymen ji wî dipirsî digot "Navê te çi ye?" Berê xwe dida me û dipirsî "Ev dibêje çi?" Me jê re digot navê te dipirse. Inca rojek "Alay Qomûtanî" hatibû denetimê (hatibû qoleçanê), hema ji nîşka ve ji îçtîmayê derket û çû ba Alay Qomûtanî ku destê wî maçî bike. Û ji Alay Qomûtanî re got "Yawo, birayê min, bavê min. Eva ez Tirkî nizanim, ji we fêm nakim ez nizanim hûn çi dibêjin, ez selam nadim we, ka ez bikêrî we û çi têm li vir?! Wele ez ne tiştek fêm dikim û ne jî tiştek dikim, hema teskereya min bidine min, min terhîs bikin ez herim mala xwe."

Alay Qomûtanî: Ev çi dibêje? Kesê Kurdî zane bila were ji wî re tercumanî bike, û emir da: "Yên Kurdî zanin yek gav pêêêêş!" Di îçtîmayê de 6 hezar kes hene 4800 kes gavek avêtin pêş.

Alay Qomûtanî: Oxlim hûn tev bi Kurdî zanin û Kurd in?

Tev bi dengekî bilind û bor "Belê"

Alay Qomûtanî: Were birako were! Em te bişeynin mala te hêj ez bixwe jî nebûme Kurd. Ku wisa dom bike dê leşker tev bibin Kurd û ev jî wateya leşkeriya Kurdî ye!

***Evdile Silêman Misircê***

# PKK ba ye!

Şabana û Enterî. Herdu jî gundên Dêrikê ne. Berî 12'ê Rezberê (Îlonê) Şabana serbixwe (Ew ji komeleya DDKD'ê veqetiyabû) û Enterî jî Apocî bû.

Yekî ji Enteriyê tê mala yê Şabanî. Ev herdu kes li ser rêxistinan dikevin gotûbêjê.

Yê serbixwe dibêje: "Apocî ecelecî ne, însên ditirsînin, mirov newêre bi wan re bipeyive." Yê ji Enteriyê dibehece û dibêje: "Niha tiştê ku devê te dibêje guhên te dibihîzin?"

Yê serbixwe ditirse û dibêje: "Ma min çi gotiye?" Yê din dibêje: "Ma te çi ne got.!"

Yê serbixwe dibêje: "Ma niha tu Apocî li vir nîn in." Yê ji Enteriyê dibêje ma tu nizanî Apocî ba ye, li her derê heye. Hema bi telaq heta li ser hîvê jî Apocî hene!"

Yê serbixwe dibêje:

– Ma tu jî bûyî Apocî?

Yê din:

– Ka xwezî ez bikaribûma bibûma Apocî. Heger min bikin endamê Apocîtiyê, 40 donim erdê min heye ezê li ser wan tapo bikim.

Yê serbixwe:

– Çima tu dixwazî bibî endam?

Yê din dibêje:

– Gava welat rizgar bibe, endamên partiyê hemû dibin parlementer.

# Gerek resmê min li ser pera keve

Şêba Jêr û Şêba Jor. Herdu jî gund in. Yek li ser Şemrex (Mazîdağ) û yek jî li ser Qoserê (Kiziltepe) ye.

Berî 12'ê Rezberê ev herdu gund jî bûbûn Apocî.

Însanên Şêbî bi baweriyeke qewîn bi Apocîtiyê ve hatibûn girêdan. Rojekê 7 Şêbî radihêjin çek û rextên xwe û dibêjin emê bigirin ser Alaya Qiziltepeyê û dibêjin armanca me jî ew e ku em û leşkerên Tirk qolekî li hevxin.


Yek ji van dibêje: "Heta resmê min li ser pera nekeve em nasekinin."

Niha herdu Şêb jî ji aliyê leşkerên Tirk ve hatine şewitandin.

***Berhevkar: Engîn Însan***

## Jûjî...

**Doğan Güzel**



## PKK'ê bang li gelê Kurdistanê kir:

# 'Newrozê di mala xwe de pîroz bikin'

*Roja nû ya pîroz, roja mizgîniya rizgarî û azadiya gelên bindest, Newroz hêviyên mezin di xwe de dihundirîne, xwe bi kesk û sor û zer dixemilîne û tê. Di vê roja giranbuha de, Kawayê Hesinkar bi çakûça xwe, serê Dehakê zalim perçiqand û riyeke fireh vekir ji bo rizgariya mirovên kole. Ji wê rojê ve mirovahî bi gavên mezintir bi pêş ve çû û nêzîkî jiyaneke layiqê mirovan bû. Ew roj bû despêka meşeke dirêj û ew meş hê jî didome.*

*Ji bo rizgariya gelên bindest, gava yekemîn, berî du hezar salan Kawayê Hesinkar avêt. Bes piştî du hezar salên din di demeke ku serdest û dagirkeran dixwestin agirê ku Kawa Pêxistibû bitefînin de, Kawayekî Hemdem Mazlum Doğan derket, çirûska ku mabû geş kir û teslîmê Zekiye û Rehşanan kir. Wan jî bi bedena xwe ew agir hîn geştir û gurtir kirin. Êdî agirê Newrozê têhna xwe daye hemû Kurdistan û gelek welatên din.*



Dîmenek ji Newrozeke berê

**Navenda Nûçeyan–** Newroz îsal bi awayekî din tê pîrozkirin. Di belavoka Komîteya Navendî ya PKK'ê de hate diyarikirin, ku îsal Newroz di malan de wê bê pîrozkirin û ji gel xwestin ku ew roj kes neçe ser karê xwe û dernekeve derve.

Ji aliyê din ve Serokwezîr Tansu Çîller daxuyand ku di sala 1995'an de wê Newrozê wek cejneke neteweyî qebûl bikin. Biryara Çîller ji aliyê pêşewayên siyasî yên Tirkiyeyê ve bi giştî piştgirî dît.

### XEBATÊN MECLÎSA NETEWEYÎ

PKK'ê bi belavokekê ragihand ku wê îsal cejna Newrozê di malan de bê pîrozkirin û xwestin ew roj kes ji mala xwe derneyê, xwe bi rengên neteweyî bixemilînin û neçine ser karê xwe. Di gel vê yekê hate diyarkirin ku wê li deverên ku merc (şert) li cih bin bi awayekî girseyî û tundî di bin kontrola ERNK û ARGK'ê de bête pîrozkirin. Di belavokê de dîsa tê gotin ku wê gerîla di Newrozê de bi şêweyekî gur û sift cerdên xwe yên li ser hêzên Tirkiyeyê bêhtir bikin.

Bal li ser şerê navbera PKK'ê û dewleta Tirk jî tê kişandin ku têkoşîna wan hatiye qonaxa hevkêşî (denge) yê. Û wiha dom dike: *"Her wek ku li giştiya welatê me rewş gihaye qonaxa hevkêşiyê, gelek dever jî ketine bin kontrola hêzên me. Di vê dawiyê de bi boykota hilbijartinê jî otorîteya siyasî ya komara Tirk hate qelskirin. Artêşa Tirk bi taybetî di 1993'yan de û di zivistana dawî de ji ber windekirinê li bajaran de asê maye. Li deverên ku artêşa faşîst a Tirk jê derketiye, PKK dest bi xebatên desthilatî û afirandina qadên azad kiriye. Di gel pêşvebirina şerê livdar ê li dijî KT'ê, ji bo desthilatiya gel, dest bi xebatên Meclîsa Neteweyî, Meclîsên Eyaletê, birêvebirên cîgehî, ekonomiya şer hatiye kirin û berepêş diçin."*

*Ji roja ku şerê çekdarî ji aliyê PKK'ê ve li Kurdistanê dest pê kiriye, her sal Newroz ji sala beriya xwe bi dorfirehtir tê pîroz kirin. Ji tirsa Newrozên ku agirê şoreşê tê de ji her demê bilindtir dibe, serdestên Tirkiyeyê xwestin Newrozê ji xwe re bikin cejna neteweyî. Li hember vê yekê PKK'ê îsal awayê pîrozkirina Newrozê li deverên ku hêza dewleta Tirk heye, guhert û bi belavokekê bang li gelê Kurd kir ku Newroza 94'an di mala xwe de pîroz bikin.*

Di belavokê de li ser standina biryarê jî tê rawestandin ku li dijî kirinên dewleta Tirk wê îsal, bi awayekî protestoyî Newrozê pîroz bikin. Wiha tê gotin: *"Li gorî biryara partiya me roja Newrozê divê herkes cih û bergên xwe yên neteweyî li xwe bike, vê roja dîrokî li mala xwe pîroz bike, dernekeve der û karistanên xwe veneke. Şeva Newrozê, weke her salê divê agirê azadî û serxwebûnê li her derê bê pêxistin û bi tirêjên rojê re her kes bikeve hundirê xwe di mala xwe de pîroz bike. Pîrozkirina me ya Newroza 1994'an ku bi giştî wê wiha be, li deverên ku merc li cih bin dikare bi awayekî girseyî û radikalî jî bê pîrozkirin. Lê divê ev di bin kontrola ERNK'ê û bi têkiliya gerîla ve be."*

Tê daxuyandin ku wê musade nedine hewlên dewletê ên ku dixwazin Newrozê ji naveroka wê bi dûr bixînin û wiha didomînin: *"Wê di vê Newrozê de bêhtir berxwedaniya aktîfî gerîla bide ser milên xwe û ji Newrozê bi şûn de ku Hefteya Qehremaniya neteweyî dest pê dike bi şêweke pêşketîtir livbaziyên xwe bidomînin û agirê Newrozê li hemû Kurdistanê rabikine pêdarê."*

### KÊFERATÊN TIRKKIRINA NEWROZÊ

Di gel biryara PKK'ê ku dixwazin li bakurê Kurdistanê Newrozê di malan de bidine pîrozkirin, rêveberiya Tirk jî lê dixebite ku Newrozê bi awayî fermî (resmî) pîroz bikin û bikin cejneke neteweyî. Ev daxuyanî ji aliyê Serokwezîra Tirk Tansu Çîller ve hate kirin û rayedarên din jî piştgirî danê.

Tansu Çîller diyar kir ku dixwazin di sala 1994'an de Newrozê bi awayekî fermî û wek cejneke neteweyî pîroz bikin. Çîller li ser biryara pîrozkirina Newrozê fikra xwe wiha derbir: *" Heke em di şerê rizgariyê de bi hev re miribin ji bo hêvişandin (muhafizekirina) serxwebûn û yekîtiya vî welatî. Pêwist e ku em di cejnan de jî bi hev re bin. Ez ê Newrozê bikime cejna Neteweyî. Wê Newroz bibe cejna hemû Tirkiyeyê. Di 1995'an de Newroz bibe cejna Neteweyî"* Cîgirê serokwezîr û serokê Giştî yê SHP'ê Murat Karayalçin jî li ser birayara Tansu Çîller ramana xwe bi vê tehrî diyar kir: "Kurltura parçeyekî ku me dike me, kultura me saxan e. Em SHP'î bi coşeke mezin destek didin ku Newroz bibe cejna hemû neteweya me, gelê me."

Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel jî daxuyandin ku di civîna Lijneya Ewlekariyê ya Neteweyî (MGK) de li ser Newrozê hatiye axaftin û gote ku ne bi awayekî resmî lê wek cejnekê dikare bê pîrozkirin. Demîrel gote ku peyvînên Tansu Çîller şaş hatine fêmkirin û gotinên xwe bi vî awayî domand: *"Ez dibêjim qey şaş hatiye fêmkirin. Newroz dikare bê pîrozkirin. Ev nabe cejneke fermî an jî neteweyî. Li Asyaya navîn, Azerbeycanê, Kirgizîstanê, Kazakîstanê Newroz tê pîrozkirin. Pîrozkirina wê ya li Tirkiyeyê jî wê yekîtiyeke çandî pêkbîne."*

### TEWRA DEP'Ê

Cîgirê Serokê giştî yê DEP'ê Remzî Kartal der barê biryara Çîller de fikrên xwe derbir û wiha got: *"Serokwezîr li gorî xwe tabloyeke mizaha reş neqş dike. Kurd li gorî xwe Newrozê pîroz dikin. Ne wek Çîller dixwaze. Serokwezîr gelekî Kurd ê ku nasnameya xwe red bike û lê tehde bê kirin dixwaze. Dixwaze ku Newrozê bixe rewşeke wiha. Ne mimkûn e ku ev yek bê pejirandin."*

Serokê Giştî yê ANAP'ê Mesut Yilmaz jî biryara Çîller wek kêferateke ji bo hilbijartinê nirxand.

Ji aliyê din ve tê xuyan ku lê tê xebitîn ku Newrozê ji rastî û himên wê dûrbixin û wate û naveroka we bê valabikin. Di gelek gotarên nivîskarên quncikên rojnameyên Tirk de kefteleftеke wisa heye û Cejna Newrozê bi çanda komarên Tirk ve tê girêdan.

## ...........NÛÇEYÊN CENGÊ...........

# Dewlet hejmara leşkeran li Kurdistanê zêde dike

- *Di nav vê hefteyê de li Kurdistanê di şer de 31 leşker, 14 cerdevan, 10 kesên sivîl û 2 gerîla mirin. Ji bilî van 2 leşker, 14 cerdevan û 17 kesên sivîl jî birîndar bûn.*
- *Ev şer ne bes, ji bo Newrozê û hilbijartinê rêveberiya Tirkiyeyê 150 hezar leşkerê din jî dişîne cenga Kurdistanê.*

**Navenda Nûçeyan–**

**9 Adar 1994–** Gerîlayên ARGK'ê avêtin ser Tabûra Sivrîtepeyê ku li ser navçeya Çelê (Çukurcayê) ye, 9 leşker kuştin û 4 leşker jî birîndar kirin. Piştî êrîşa gerîlayan, hêzên dewletê jî dest bi operasyonan kirin û 2 gerîla mirin.

Li gundên Doğanca û Köprüyê ku li ser navçeya Berwariyê ne, gerîlayên ARGK'ê kemînek li pêşiya hêzên leşkerî danîn. Di şer de 7 leşker birîndar bûn. Ji hêla din ve hêzên leşkerî li navçeya Qereqoçanê ku li ser Xarpêtê (Elezîzê) ye ketin kemîna gerîlayên ARGK'ê, 3 leşker mirin û 8 cemseyên leşkeriyê jî xesar dîtin.

Hêzên leşkerî gundê Miwêla ku li ser Sêrtê ye, bombe kirin, 7 kes (gundî) mirin. Hêzên leşkerî yên ji Qereqola Nehya Eynê (Bağgöze), ev serê hefteyekê ye ku der û dor didin ber bombeyan. Di bombekrinê de ji mala Hecî Osman 7 kes mirin.

Berendamê bi navê Selahattîn Bulut yê ku gerîlayên ARGK'ê roja duşemê (7'ê Adarê) revandibûn, ji aliyê hêzên dewletê ve hate binçavkirin. Selahattîn Bulut li nehya Kaniyahanê (Bekîrhan) ku li ser Ellihê ye di partiya ANAP'ê de xwe wek berendam rê dabû.

**10 Adar 1994–** Li gundê Kanîbangê (Yarimkaş) ku li ser navçeya Çinarê ye, mînîbusa cerdevanan li mayîna ku gerîlayan li ser rê bi cih kiribûn qelibî, 10 kes mirin û 11 kes jî birîndar bûn.

Ji hêla din ve li gundê Xanikayê ku li ser Hezexê ye, mînîbusek cerdevanan li mayîna gerîlayan qelibî, 4 cerdevan mirin û 3 heb jî birîndar bûn.

Di operasyona hêzên leşkerî ya ku li çiyayê Suphanê çêdibin de 4 leşker ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hatin kuştin.

Li navçeya Şenkayayê (Olitîlî) ku li ser Erziromê ye, 9 leşkerên ku ji operasyonan vedigeriyan di bin aşîtê (şepe) de man û mirin.

Gerîlayên ARGK'ê girtin ser tabûra navçeya Kerboranê ku li ser Mêrdînê ye, gelek xesara maddî dane avahiyên fermî, lê der heqê mirî û birîndaran tu agahî neket dest.

**11 Adar 1994–** Li Amedê kesên nenas li Taxa Elî Paşayê muxtar Abdulkadir Sular (55) kuştin. Li Derê Ruhayê jî Behçet Erkek (43) ji aliyê kesên nenas ve hate kuştin.

14 xwendekarên Zanîstgeha Dîcleyê û Dibistana Bilind ya Batmanê hatin binçavkirin.

Hêzên leşkerî li gundên navçeya Elbîstanê ku li ser Mereşê ye, dest bi operasyonan kirin. Di operasyonan de gelek xanî, ji aliyê leşkeran ve hatine xerakirin.

Gerîlayên ARGK'ê li ser riya Dihê (Eruh) û Sêrtê kontrola nasnameyan kirin.

Li tabûra Kerxorê ku li ser Berwariyê ye, leşkerekî çeka xwe berî xwe da û xwe kuşt.

**12 Adar 1994–** Hêzên dewletê li çiyayên Agirî, Tendurek û Suphanê operasyonan didomînin. Di van operasyonan de heta vê gavê 4 leşker li Mixtepeyê mirine û 11 leşker jî birîndar bûne.

Li Dîgorê 15 kes ji aliyê dadgehê ve hatin girtin. Di nav van 15 kesan de birê berendamê serbixwe Alî Fikret Ayman jî heye.

Hêzên dewletê li gundên Banê (Güçlükonak) Şikeftiya (Kaşkonak), Kerxwar (Demîrboğaz), Zivinga Şikaka (Ağaçyurdu), Gohîna (Çetînkaya) û Xursê 63 xanî hatin şewitandin. Ji bilî xanî şewitandinê leşkeran li gundiyan jî îşkence kirin.

Li Dîgorê hêzên dewletê dixwaze gundiyan li hemberî PKK'ê têxin mitînga ku wê di 13'ê mehê de çêbibe. Ji bo vê yekê jî tîmên taybetî bi zorê û bi tehdîdan xelkê dawetî mitîngê dikin.

**13 Adar 1994–** Ji bo Newroza 94'an û hilbijartinên Adarê, ji rojavayê Tirkiyeyê bi deh hezaran leşker ber bi Kurdistanê ve diçin. Bi pirranî ev leşker bi balefiran ve (her roj 300 leşker) tên balefirgeha Amedê û ji wir jî diçin deverên Kurdistanê yên din.

Li Edenê û Mêrsînê bombe li postaxane û qehweyê teqiyan, 17 kes birîndar bûn.

Li Amedê mirovek bi navê Erdînç Başer, ji bo tecîlkirina leşkeriyê di 3'yê Adarê de diçe şûbeya leşkeriyê û dû re meytê wî li dor baraja Dewegeçîdî tê dîtin.

Hêzên leşkerî li gundê Kurtikan (Tokaçli) ku li ser navçeya Tûxê ye, ji bo ku gundî malê xwe vala bikin. Trafoyê ceryanê şewitandin, Ji hêla din ve li 20 gundên ku di navbera Tûxê û Wanê de ne, dîrekên wan î elektrîkê jî aliyê leşkeran ve hatin şewitandin.

Muxabîrê rojnameya Özgür Gündemê yê Ruhayê Nazim Babaoğlu winda ye.

**14 Adar 1994–** Gerîlayên ARGK'ê cerdî ser avahiyên neftê (petrolê) kirin. Di sergirtinê de, gerîlayan 2 çek ji parezgerê avahiyê standin. Gerîlayan di sergirtinê de agir berî neftê dan, nêzîkî 3 milyar TL. xesar li avahiyê çêbû.

Hêzên leşkerî girtin ser gundên Kurtikan û Paşvaskê ku li ser navçeya Tûxê ne, 2 kes binçav kirin. Wek tê zanîn, rojek berê leşkeran trafoya van gundên der û dorê ji bo ku gundî koç bikin, şewitandibûn. Di sergirtinê de, leşkeran hefteyek mudet ji bo valakirinê dan.

Li gundê Mînarê ku li ser Hewêlê (Baykan) ye, hêzên dewletê 8 gundî (ku her heşt jî kalê gund in) binçav kirin.

Li Wêranşarê bav û birayê komûtanê (Koordînator) Eyaleta GAP'ê Hasan Ağaç, Ismaîl û Nesîh ji aliyê hin kesên nenas ve hatin revandin.

**15 Adar 1994–** Gerîlayên ARGK'ê li navenda navçeya Îdirê êrîşî cemseyeke leşkerî kirin. Di êrîşê de serleşkerek (üsteğmen) mir û 4 leşker jî birîndar bûn.

Ji hêla din ve li navçeya Cizîrê gerîlayan erebeyeke polîsan dan ber guleyan. Di êrîşê de polîsek birîndar bû.

Li navçeya Bazîdê ku li ser Agirî ye, hêzên dewletê 13 kes binçav kirin. Ji hêla din ve li gundê Hecîhesen a Mêrdînê û gundê Salih ku li ser Erxeniyê ye 3 kes, ji aliyê leşkeran ve hatin binçavkirin.

Hêzên leşkerî derketina gundiyên Kewê (Çetîn Kul) ku li ser Dihê ye, qedexe kirin. Komutanê Qereqola Dihê Hüseyîn Kurt, ji bo ku gundê Kewê cerdevanî qebûl nekiriye, di nav hefteyên borî de dest danîbû ser nasnameyên gundiyan. Li ser vê yekê jî ew kesên ku dixwazin ji gund derkevin û rêwîtiyê bikin, ji aliyê leşkeran ve tên vegerandin.

Berendamê Partiya Riya Rast (DYP) yê nehya Civanîkan (Gökçebağ) Bedrî Çîçek, ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate revandin. Piştî revandina berendam, hêzên dewletê li hemberî DEP'vanan dest bi pestê kirin.

# NÊRÎNEK

M. Alî Tüysüz

## Dewlet û Kurd

Dewleta Tirk di van mehên dawîn de bi hemû hêzên xwe ve bûye yek ku tevger û têkoşîna rizgarîxwaz bifetisîne. Li hemû deverên Kurdistanê her roj zilm, zordarî û lêdana dewletê dibe sedemên xwînrijandinê. Hêzên leşkerî, cerdevan û kontra êdî eşkere kê bixwazin dikujin. Gund, bajar, çiya û daristanên welêt her roj bi bombekirinan tên hilweşandin û şewitandin. Dewlet bi wêran û tarûmarkirina axa me dixwaze welatê Kurdan vala bike, çavê gelê Kurd bitirsîne ku gel piştgirî nede "terorîstan".

Êrîşên dewletê çend meh berî hilbijartinên belediyan dest bi zêdebûnê kirin. Armanca dewletê ne ev bû ku DEP xwe ji hilbijartinê vekişîne. Na, armanc ev bû ku DEP û tevgera Kurd a şoreşger bi derbên mezin ji hêz bixîne û bi darê zorê wisa bike ku rayên DEP'ê daxe hejmareke mînîmûm. Bi vî awayî dewletê dil dikir ku raya giştî ya welêt, a Tirkiyeyê û ya cîhanê bawer bike ku alîgir û piştgirên DEP'ê û şerê neteweyî bi qasê ku xuya dikin nîn e.

Ji bo ku planên xwe bixe jiyanê dewletê operasyonên xwe yên leşkerî bêyî ku rewşa aborî bifikire zêde û dorfireh kir. Di operasyona Zelê, Ararat û Çiyayê Qato û gelek deverên din de bi bêqedar bombe reşandin. Êrîşên dewletê ne tenê li dijî gerîla, lê belê bi her awayî wisa hov bûn ku vê biharê bikaribin derbên mezin li tevgera Kurd bixînin. Ji bo vê, ji butçeya 94'an 400 trilyon hatiye veqetandin. Di eynî wextê de gelek navçe û gundên welêt dane ber gullebaranê. Di êrîşên kontra û cerdevanan de roja ku bi dehan Kurd nehatana kuştin tune ye û ev hîn jî berdewam in. Gelek avahiyên Partiya Demokrasiyê, –avahiya navendê jî tê de– hatin bombekirin. Êrîşên dewletê û hêzên tarî ku bi dewletê ve girêdahî ne li ser rêvebir, berendam û xebatkarên DEP'ê wisa zêde bûn ku, DEP mecbûr ma ku xwe ji hilbijartinên belediyeyan ên 27'ê Adarê vekişîne. Dewlet bi vê jî razî nebû û bi hemû parlementerên xwe ve çû ser parlementerên Kurd û îmmunîtya (muafiyeta) wan jî rakir. Lê li ber deriyê parlementoyê ji aliyê polîsan ve girtina çend parlementerên Kurd û xistina wan a binçaviyê hemû planên dewletê serobin kir. Helbet dewletê nedixwest ku ev pirs bibe sedemên protestoyên Ewrûpayê. Dewletê nedixest ku DEP xwe ji hilbijartinan jî vekişîne û grubek parlementerên Kurd berî hilbijartinan ji parlementoyê bêne derxistin. Armanc hêdî hêdî helandin û teslîmgirtin û xelaskirin bû. Lê hesabê malê û yê bazarê hevdu negirt. Bûyer li pey hev hatin û girêka bên qetiya. Êdî kontrolkirina bûyeran di demeke wisa kin de ne mimkûn bû..

Helbet ev hemû aliyekî rastiyê ne. Li aliyê din wisa xuya ye ku dê Kurd di demeke nêzîk de mafên xwe yên demokratîk û neteweyî bi dest xînin. Gelek krîter vê dîtinê xurt dikin. Mirov dikare li vir behsa çend xalan bike; partî û siyasetvanên vê sîstemê an jî ya vê rejîma paşverû ketine rewşeke pirr xerab. Ew jî êdî vê qebûl dikin. Îdeolojiya fermî êdî nikare ji îro pê ve gel bixapîne. Mimkûn e ku Atatürk di çend bûyerên din de jî bikaribe wan û rejîma wan ji bo demeke din li ser lingan bisekinîne. Pişt re êdî ew jî dê nikaribe pêşî li protestoyên girseyî û şoreşê bigire.

Dîsan ji aliyê aborî ve jî, dewlet di krîzeke mezin de ye û ber xwe nabîne. Hem develuasyona fermî ku hat çêkirin û hem jî ya ne xuya ku roj bi roj nirxa Lîra li hember dowîzê dixîne û hem jî enflasyon û problemên butçeyî ku êdî ne mimkûn e bête çareserkirin, rê li ber problem û krîzên civakî û siyasî vedike. Ev hemû li aliyekî, li aliyê din jî piştgiriya dewletên împeryalîst jî wê ji bo dewleta Tirk kêm bibe.

Ev hemû ji bo Kurdan elametên xêrê ne. Dewletê bi dîplomasiyeke xurt sala 93'an filitandibû. Lê wisa xuya ye ku Kurd dê di sala 94'an de di dîplomasiyê de jî gavên giring biavêjin û der û dorê li komara Tirk teng bikin.

Alfabeya Kurdî: Babeta muneqeşeyên kronîk – 3

# Alfabeya Celadet keda rewşenbîran û gelek salan e

*Xaleke din e muneqeşeya li ser alfabeya Kurdî, ji bo sedemên teknîkî kêmkirina tîpan e. Ango betalkirina tîpên bi kumik (ê, î, û) û yên bi niçik (ç, ş). Armanc ew e ku tenê tîpên standard ên navneteweyî werin bikaranîn ku di klavyeyên komputer û tîpnivîsan (deqtîloyan) de hebin. Tîpên standard 26 in. Qasî ku ez dizanim, ew tenê têra alfabeya Îngilîzî dikin. Welatên din giş li gora alfabeya xwe klavyeyê diguherînin. Kesek ji bo klavyeyê alfabeya xwe naguherîne.*

**Baran Rizgar**

Sala pêşîn min di danasîna alfabeyê de xwendekar ji du tewre bilêvkirinên **ç, e, h, k, p, r, t, x** agahdar nekirin. Ji lew re gava ku ev tîp bi aksan dihatin bilêvkirin dijwarî didîtin. Carinan **tu** wek **du, pê** wek **bê**, hwd. dinivîsin. Salên din min ew di destpêkê de jê haydar kirin, kêmtir çewtî kirin. Hin kes ji bo van bilêvkirinên cuda jî tîpan dixwazin. Ev babet jî, ji mêj ve xaleke muneqeşeyê ye. Hin kes jî, ji bo hinan dixwazin û ji bo hinan jî naxwazin. Divê berpêçûnên mirov hevgirtî bin. Du rê hene: An mirov ji gişan re tîpên nû hildibijêre (8 tîp), an jî mirov vê babetê dike pirseke ferhengzaniyê û di çarçoveya ferhengzaniyê de li ser muneqeşe dike. Hek em 8 tîpan li alfabeyê zêde bikin, wê bibe **38** tîp. Ev giran e. Fêrbûna wê dê pirr dijwar bibe. Bi dîtina min, divê mirov di çarçoveya ferheng û ferhengokan de li ser vê pirsê biseкine. Ji ber ku min nêrîn û encamên lêkolînên xwe yên li ser van, di pêşgotina ferhenga xwe ya **"Kurdî– Îngilîzî, Îngilîzî– Kurdî"** û pirtûka **"Dersên Kurdî"** de nivîsîne, hewce nake ez li vir ducar bikim.

### DU TÎPÊN BI HEV RE

Hin kes jî, ji van heşt tîpan li ser **r** tenê disekinin û **r**'ya biaksan (a gindêrkirî) bi du **r**'yan (**rr**) dinivîsin. Lê belê, qaîdeya xwe hevgirtî bi kar naynin. Wek ku tê zanîn, **r** di destpêka peyvê de her biaksan e. Wê gavê divê peyvikên ku bi **r** dest pê dikin (wek **rê, rû, roj,** hwd) giş bi du **r**'yan (wek **rrê, rrû, rroj**) dest pê bikin. Her wiha **r** di nava peyvikan jî de biaksan tê bikaranîn û tew carinan du **r**'yên biaksan an jî yeka biaksan û yeka bêaksan li pey hev tên (wek **pirreng, serrû, pirrû, berran,** hwd. divê wiha bên nivîsîn: **pirrreng, serrrû, pirrrû, berrran**). Di hin peyvikan jî de, du **r**'yên biaksan hene; wek: **karekar, kirkirok, perperok, pirpar, birebir, barebar, çirçirk, çirçirok**; li gorî vê qaîdeyê divê ew jî wiha bên nivîsîn: **karrekarr, kirrkirrok, perrperrok, pirrparr, birrebirr, barrebarr, çirrçirrk, çirrçirrok**. Bê guman, ev ne tu metod e. Îcar hek mirov bibêje, na, emê **r**'ya biaksan tenê di dawiya hin peyvikan de cot binivîsin, ango kengî hez bikin (jixwe wisa dikin), ev jî ne tu zimanzanî ye. Tiştekî din jî heye: gindirandin an jî stûrkirin û du caran bilêvkirina dengekî ne eynî ye. Jixwe di Kurdî de, ji xêndî peyvikên hevedudanî, tu tîp li pey hev ducar nabin. Ev jî taybetmendiyeke Kurdî ye. Ev xurde–qaîde, li gel ev çend hevnegirtinan, prensîba alfabeya Kurdî ya ji bo dengekî du tîp bikarneanînê jî dixe bin lingan.

### KÊMKIRINA TÎPAN

Xaleke din e muneqeşeya li ser alfabeya Kurdî, ji bo sedemên teknîkî kêmkirina tîpan e. Ango betalkirina tîpên bi kumik (**ê, î, û**) û yên bi niçik (**ç, ş**). Armanc ew e ku tenê tîpên standard ên navneteweyî werin bikaranîn ku di klavyeyên komputer û tîpnivîsan (deqtîloyan) de hebin. Hin kes carinan faks jî di nav wan de dijmêrin. Tu eleqeya faksê bi tîpan re tune. Ew ne ji bo nivîsînê, lê ji bo guhastinê ye. Tîpên standard **26** in. Qasî ku ez dizanim, ew tenê têra alfabeya Îngilîzî dikin. Welatên din giş li gora alfabeya xwe klavyeyê diguherînin. Kesek ji bo klavyeyê alfabeya xwe naguherîne. Jixwe adaptasyona klavyeyê ne tenê ji bo tîpan e, her wiha ji bo cihên tûşan e. Tîpên pirrtirîn tên bikaranîn li nava klavyeyê û yên kêmtirîn tên bikaranîn li qerax û qoziyên klavyeyê tên sazkirin. Wek mînak di Tirkî de **a û e** herî pirr e, ew li nava klavyeyê ne. Lê di klavyeya Îngilîzan de li nava klavyeyê **h û j** hene, **a** li qeraxê ye, **e** nêzîkî qeraxê ye. Îcar tîpnivîs jixwe her diçe cihê xwe didin komputoran. Lewre divê muneqeşe li ser komputorê were kirin. Di komputoran de jî sazkirina klavyeyeke ji bo alfabeya Kurdî ne pirr dijwar e. Li Swêdê, hin ceribandin hene, serketî ne. A giring em bizanibin ku em çi dixwazin.

### RASTNIVÎSA WEK ZIMANÊN EWRÛPÎ

Ew kesên ku dixwazin ku em tîpên bi kumik û yên bi niçik rakin, ji dêvla wan nivîsîna du tîpan pêşniyar dikin. Wek hin zimanên Ewrûpayî (Îngilîzî, Fransewî hwd.) Tîpên ku pêşniyar dikin wiha ne:

**ç:** ch
**ê:** ei an jî ee
**î:** ee an jî ei
**ş:** sh
**û:** oo an jî ou
**x:** gh

Gelo xwediyê pêşniyaran ev awa di tu tekstan de ceribandine? Min xwe negirt û ceriband. Va ye hevokeke "Welat bi herdu awayan dinivîsim:

**Deenei eizeedee kevintireen oo peiweestireen deenei Kurd oo Kurdistanei ye.**

**Dînê êzîdî kevintirîn û pêwîstirîn dînê Kurd û Kurdistanê ye.**

Yek bi **65** tîpan û yek jî bi **52** tîpan hatiye nivîsîn. Di rûpelekî ji **50** rêzan pêkhatî de, emê **650** caran zêdetir tiliyên xwe li tûşan xin, di pirtûkeke **300** rûpel de, **195.000** caran. Her wiha yek **11 cm** û yek jî **14 cm** dirêj e. Di rûpelekî ji **50** rêzan pêkhatî de, emê **150 cm** dirêjtir binivîsin, ango pirrtir kaxez bi kar bînin. Gelo ew ên ku ji bo kumikekî du alfabe afirandin, ewê ji vê re bibêjin çi?

Mînakeke din:

**eidee zarokein Kurdan jee keda ghwe dighin shoreshei**

**êdî zarokên Kurdan jî keda xwe dixin şoreşê**

Ez bi xwe dikarim, piştî hinek pratîk, bi vî awayî bixwînim û binivîsim. Ji ber ku ev deh sal in, ez bi Îngilîzî re têkildar im. Ji min re problem dê zehmeta nivîsîna ekstra be. Lê belê, ji bo kesên ne Îngilîzîaxêv, bi dîtina min, ew ê wek xaçepirsan be.

Pêşniyarek jî heye ku rakirina **i** dixwaze. Dibêjin ku di alfabeya Kurdî ya bi tîpên Erebî de **i** tune, lewre em jî dikarin wê rakin. Tunebûna **i** di nav tîpên Erebî de ne avantaj, lê dezavantajeke wê alfabeyê ye. Di xwendin û nivîsînê de dijwariyan derdixe. Ka em mînakekê bidin: **girtin, dilnizm,** divê wek **grtn, dlnzm** werin nivîsîn. Gelo xwendekarên destpêkê wê çawa bikaribin texmîn bikin ku li ku **i** heye û li ku tune ye? Ji aliyekî din jî di gelek peyvikan de wê dengdêr (tîpên bideng) tunebin. Di alfabeyên fonetîk de ev dibe bêmantixiyek.

Îcar li ser bingeha tiştên ku min heta niha gotin, ez di alfabeyê de tu guhertinan pêwîst nabînim. Gava ku mirov hemû faktoran dide ber çav, pêşniyarên guhertinan ên ku heta niha hatine kirin, mirov qane nakin ku dê tesîreke erênî (pozîtîv) ya giştî li fêrbûna xwendin û nivîsîna Kurdî bikin. Diyar e ku hin ji wan wê, berevajî, tesîreke neyînî bikin: Ji dewsa tîpên bi kumik (**ê, î, û**) û yên bi niçik (**ç, ş**) du tîp (**ei, ee, oo, ch, sh, hwd.**) bikaranîn, rakirina **i**.

Li vir tenê niqteyek dimîne: pevguherîna **i** û **î**'yên Kurdî bi **ı** û **i**'yên Tirkî.

Wek ku min li jor rave kir.

**a)** Dijwariyên ku Kurdên Bakur di destpêka fêrbûna xwendin û nivîsîna Kurdî de, ji ber cudabûna alfabeyên Kurdî û Tirkî dibînin, ne tenê ev e. Ev dijwarî 5 xal in û ev xal, yek ji yên ku zûtir bi ser tên ketin e. Ji ber vê yekê hek sivikahiyekê bîne jî, ew ê pirr qismî be û tenê detayek be. Ji aliyekî ve jî, ewqas dijwarî di destpêka fêrbûna xwendin û nivîsîna zimanekî de pirr normal e. Ez nêrînên xwe yên di vê xalê de li ser bingeha xwendekarên fêrbûna xwendin û nivîsîna Kurdî yên ciddî datînim. Gazinên wan kesên ku ji salan mehan carekê nivîsîn û xwendina Kurdî tê bîra wan û hîn di roja pêşîn de dest bi gazin û pêşniyaran dikin, ne babeta vê nivîsê ye.

**b)** Ji bo sivikahiyeke ewqas qismî û tenê li parçeyekî welêt, ne hêja ye ku mirov alfabeyê biguherîne û ferheng, pirtûk û kovarên ku di demeke ewqas dirêj de hatine weşandin îhmal bike û ji bo sedemên sivik, guhertina alfabeyê meşrû bike. Lewre ewqas hincet her tim peyde dibe. Jixwe, êdî Tirk jî, ji bo **i**'ya dirêj ku bi peyvikên biyanî re dikeve nav Tirkî, **î** bi kar tînin. Tiştekî din jî heye, niha Tirk hewl dikin ku ji bo hemû Tirkan alfabeyeke hevpar amade bikin. Meyl ew e ku hin tîpên din jî li alfabeya niha zêde bikin ku ew bibe ya hemû Tirkan. Bi dîtina min, tenê du tewre pêşniyar dikarin guherandina alfabeyê mafdar û meşrû bikin:

**1)** Pêşniyareke ku bêyî afirandina astengên nû, bi awayekî giştî, Kurdî adapteyî klavyeya standard bike. Heta niha derneketiye.

**2)** Pêşniyareke ku bêyî afirandina astengên nû bi awayekî giştî cudatiyên di navbeyna Kurdî û Tirkî de ji holê rake, an jî hindiktirîn bike. Ew jî heta niha derneketiye.

Heta ku pêşniyarên wiha dernekevin jî tenê riyek heye: Mirov ji alfabeya xwe, ya ku keda gelek salan û gelek rewşenbîrên hêja ye re hurmetê bike, nehêle ku ew bibe babeteke her tewre muneqeşeyên kronîk û dem, ked û enerjiya xwe ji bo di nav gel de belavkirin û danasîna wê serf bike. Da ku em jî bizanibin ku emê çi fêrî xwendekarên xwe bikin!

*Dijwariyên ku Kurdên Bakur di destpêka fêrbûna xwendin û nivîsîna Kurdî de, ji ber cudabûna alfabeyên Kurdî û Tirkî dibînin, ne tenê ev e. Ev dijwarî 5 xal in û ev xal, yek ji yên ku zûtir bi ser tên kêtin e. Ji ber vê yekê hek sivikahiyekê bîne jî, ew ê pirr qismî be û tenê detayek be. Ji aliyekî ve jî, ewqas dijwarî di destpêka fêrbûna xwendin û nivîsîna zimanekî de pirr normal e. Gazinên wan kesên ku ji salan mehan carekê nivîsîn û xwendina Kurdî tê bîra wan û hîn di roja pêşîn de dest bi gazin û pêşniyaran dikin, ne babeta vê nivîsê ye.*

# Seravêtinên keçikan

**Nûşer Dîlan**

Keçikên Kurd, mîna hemû keçikên gelên gerdûnê bi dil û evîndar dibin. Lê tu caran dildariya xwe eşkere nakin. Di dilê xwe de dihêlin, bi dilekî xemgîn ditemirînin. Şerm û fedî dikin û ditirsin ku nav û dengê wan li guhê gundan belav bibe. Êdî mefera wan ku dimîne, ji dûr ve di bin dûvkê çavan re li lawikê xwe binihêrin û şewata dilê xwe hinekî biferikînin.

Dildarê wan carinan kurmam (kurap) e carinan kurxal e. Carina jî, ji gundekî xerîb e (biyanî). Bihar, havîn û payîzan ku hev û din digirin û diçine bêriyê, aşêfê, çinîna qirşikan û wan şewata dilê xwe, bi dilokên evîniyê û seravêtinan lawikên xwe hunik dikin.

Keçik bang dike lawikê xwe. Ew lawikên ku di xewnê şevan de tim û tim lê balê ye. Dibêjin:

**"Were mala me bi mêhvanî**
**Ji te re bigurênim wî berxî wî beranî**
**Heke diya min û bavê min go kanî**
**Ezê bêjim şivan kerr û gêj bû, ji çiyê neanî"**

Carina jî meşa lawik wê gelekî xemgîn dike û dilê wê bi xwe re dibe. Êdî xwe hew digire û bang dike:

**"Lawiko dîno di ber mala me re meş meş neke**
**Tu dûkê çixara xwe li min geş neke**
**Çavê xwe li tu keçikên din negerîne**
**Ez ya te me xwe şaş neke"**

An jî çaxê ku lawik jê bêriya (bê xeber e) û xwazgîniyan naşîne mala keçikê, keçik giliyê xwe dike û di bêje:

**"Eba kurk û eba hirî**
**Di divê derîkê mala bavê min re bûrî**
**Heta tu bi dê û bavê xwe şêwirî**
**Xelkê hat û qelen birî"**

Dema ku keçik dilê xwe berdide hinekan ji gundê xerîb û lawik xayînetiyê lê dike, wê çaxê keçik bi gilî û gazin dibêje:

**"Gundê me gundê serî ba**
**Şirik herikîn bi mezrîba**
**Çawa xortên çeleng hebin di gund de**
**Yek çavê xwe berde keçikê van xerîba"**

Li gundên Kurdistanê dildarên Kurd silav û lêpirsînên xwe bi qasiran (qasidan) ji hev û din re dişînin. Dema ku silav digihêjin keçikê, bi xweşhaliyek mezin vedigire, ew jî silavê xwe bi qasir re dişîne:

**"Silav hat û ser silavê**
**Ezê têxim qotîke zîv û zêr û dev ziravê**
**Ji bona delalê xwe keçikê**
**Bişînime xopana Midyadê taxa navê"**

Gelek caran keçik bi dildariyeke mezin dil dikeve kurmamê xwe. Êdî çavê wê kesekî din nabîne. Evîna xwe ser hemû tiştî re digire:

**"Lo lo kuro kurê mamê**
**Xencer zîvo şuxlê şamê**
**Xwezka bav û birê min ez bidamê**
**Bila gawir ketiba ser pişta îslamê"**



*Li gorî kevneşopên civaka Kurd keç, hezkiriyê xwe eşkere nake, di dilê xwe de dilêle. Carinan jî, bi stran an jî bi riyên din evîndariya xwe dide diyarkirin.*

Li gundên Kurdistanê dildar ji fedîbûna tu car fersenda civînê nabînin. Tu carî nikarin werin cem hev. Mefera wan ku dimîne êdî bi xefî û bi dizîka di qulkê re bigihîjine hev. Keçik ji lawik re biryara civînê dide:

**"Were mala me bi dizîka**
**Derî veke bi tilîka**
**Heke dê û bavê min go ew çi bû?**
**Ezê bêm kitka (pisîk) me ye, hatiye ser çêlîka"**

Êdî ku gundî bi wan dihesin û seba wan dikin, keçik xwe diparêze û dibêje:

**"Weyla gundo wa gundîno**
**Kevir û kuç li we barîno**
**Çima hûn bextê mi reş dikino**
**Kengê we ez û delalê dila bi hev re dîno"**

Lê êdî keçikên Kurd vê hingê dildarên xwe rêdikine nav refên gerîla û wiha dibêjin:

**"Çiya bilind in te nabînim**
**Nameyekê bişîne da bixwînim**
**Heke tu nexweş î ez hekîm im**
**Heke tu birîndar î ez nemîn im"**


## Hejmara Nûdemê ya 9'an derket

**DI VÊ HEJMARÊ DE:**

Cumhûriyeta Kurdî ya Mehabadê/ F. Cewerî
Bersiv 1/ Hesenê Qazî
Bersiv 2/ Kerîm Husamî
Bersiv 3/ Mahmod Mola Ezat
Ji bo Yilmaz Güney/ Rojen Barnas
Kela Dimdimê/ Haviz Qazî
Du helbest ji/ Xelîl Battî
Du helbest ji/ Şirin Bozarslan
Keça Kurd Zengê/ Cemşid Bender
Sê helbest ji/ Orhan Velî werger: Latîf Özdemîr
Resamê Kurd/ Xelîl Duhokî
Hilkişîna bajarekî/ Dilawer Mêqerî
Xalid Axayê Zêbarî/ Zeynelabidîn Zinar
Çirûskin/ Dêrsim–Memo, werger: Husên Hebeş
Keçika piçûk/ M. Alî K.
Du şehîd, du jiyan/ Nûrî Aldûr
Evîndara ji Helepçeyê hatî/ Suzan Samanci, werger: Mehmed Uzun
Ji bo Yezdan/ Medenî Ferho
Jana Gel/ Sebrî Botanî
Em xerîb in/ C. Alî Bedirxan
Helbestên Amerîka Latînî/ Bedirxan Epözdemîr
Muhacirtî û rewşa keçan/ Ş. B. Soreklî
Jean Paul Sartre/ Firat Cewerî
Evîn/ Mayakovskî, werger: Süleyman Demîr
Sê helbest ji/ J. Espar
Li ser sê pirtûkên Beçîkçî/ Gabar Çiyan
Kovarên Kurdî; Armanc, Welat, Rewşen, Roja Nû, Govend, Nûbihar/ Lokman Polat
Agora/ Mustafa Aydoğan

**Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata Kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!**

*Navnîşan:* Termov. 52, 175 7 Järfälla/ Sweden. Tel û Fax: 8–583 564 68

# Newroz cejna rizgarî û azadiyê ye



## Şitla azadî

***Şitla bexçê azadiyê***
***Kulîlk veda li Adarê***
***Bircên Kela Diyarbekir***
***Bi Zekiye reng vedikir***

***Şitla azadî her bijî***
***Nava dilê Kurdan dijî***

***Agrê nava dilê Ferhat***
***Nav dilê Zekiyê şîn hat***
***Agirê azadî pêtî da***
***Tînê dide axa welat***

***Şitla azadî her bijî***
***Nava dilê Kurdan dijî***

***Wek tîrêja agrê Newroz***
***Cejna Alkan dike pîroz***
***Ew awirên Mehmût Zengîn***
***Boy Zekiye bûye Evîn***

***Şitla azadî her bijî***
***Nava dilê Kurdan dijî***

***Necmî rabûye silavê***
***Eşref bilda ala partiyê***
***Zekiye bi xemla bûkê***
***Hemêz dike agrê Newroz***

***Şitla azadî her bijî***
***Nava dilê Kurdan dijî.***

Nîşe: Ev helbest ji aliyê Alî Temel ve hatiye çêkirin û di kaseta Koma Çiya "Rozerîn" de hatiye strîn.

**S. Özcan**

Newroz cejn e. Cejna gelên Arî ye. Newroz sembol e; sembola serhildanê ye. Newroz mizgîniya destpêka biharê ye. Newroz cejna rizgarî û azadiyê ye. Newroz 2606 sal berê, bi serhildana Kawayê Hesinkar ya li dijî Dehakê zalim û xwînxwar dest pê kiriye. 612 sal berî zayînê (B.Z/berî mîladê) QralêAsûr Dehakê zalim li ser gelên herêmê kotekiyeke bêxaye (bêhesap) dida meşandin. Gelên herêmê di bin kotekî û koletiyeke pir dijwar de, bi awayekî bêhavil jiyana xwe derbas dikirin.

612 sal berî zayînê bi salnameya Rûmî 8'ê Adarê, bi salnemeya Mîladî 21'ê Adarê û li gorî baweriya Zerdûştiyan jî 1'ê Adarê li paytexta Asûriyan li Nînowayê Kawayê Hesinkar bi çakûça xwe, serê Dehak perçiqand. Dawî li kotekî û hovitiya wî anî û agirê serkeftinê pêxist. Ew agir bû agirê Cejna Newroz'ê. Ango roja nû. Bi rastî jî, ji bo gelê Arî rojek nû dest pê kiribû.

Midiyan pêşiyê Kurdan, di wê demê de bi navê Medya, an jî Mîdya împaratoriyek damezirandin li ser xaka Mezopotamyayê, lê ne Med bitenê rizgar bûbûn; bi wan re gelê Ariyan hemû gihiştibûne rizgariya xwe. Newroz çiqas cejna Kurdan be jî di nav hemû gelê Ariyan de tê pîrozkirin.

Împeratoriya Medya; li gorî hinek lêkolînvanan piştî 250 salan û li gorî hinek lêkolînvanan jî piştî 420 salan helişî. Agirê Newrozê jî, wek vemirî hate xuyan. Lê dîsa jî car caran pêta agirê Newrozê bi can û giyana neviyên Kawa ve geş bû û pê re bilind rabû. Weke Palo, Kocgirî Dêrsîm, Zîlan, Dîyarbekir, Agirî (Ararat) Sason, Motkan (Mutkî) Mahabad, Berzan Helepçe, Şirnex, Cizîr, Lîcê û gelek deverên din.

Hinek caran Dehak derketin holê. Lawê Medya bi pakrewanî li hemberî kotekî û hovîtiyên wan derketin. Dîsa jî xwelî girtibû rûkê agirê Newrozê, wek vemirî. Ber bi bîrakirinê ve diçû rengê agirê Newrozê û Agirê Kawayê Hesinkar. Dehak derketibûn li ser xaka Mediyan.

*Berî berxwedana Kawayê hemdem Mazlum Doğan, bi rastî jî gelê Kurd ketibû qonaxeke pir xerab. Ew qonaxa ku gelê Kurd nikaribû cejna xwe pîroz bike. Gelê Kurd tu car ew çend ji cejna xwe dûr neketibû; navê cejna xwe ji bîra kiribû û ji xwe re bûbû biyanî.*

Gelê bindest (Kurd) bêhêvî û bêhavil mabû, li bendewarê hatina Kawa bû.


Dîsa weke wê rojê bû. Lê ne beriya zayinê sala 612an, piştî Zayînê. Piştî zayînê, 21'ê Adara 1982'an. Ne li paytexta Asûran li Nînowayê di qesra Dehak de, li paytexta Kurdistanê, di zîndana bajarê Amedê de geş bûbû, pêt dida, pêxistibû agirê Newrozê, agirê Kawayê hemdem Mazlum Doğan. Pêl bi pêl belav dibû tîn û çîkên agirê Newrozê li ser xaka Kurdistan. Bêhêvîtî û bêhavîltî tevî dîroka reş bû û dawî lê hat. Hêvî û bawerî di dewsa wan de cih sitandin.

Berî berxwedana Kawayê hemdem Mazlum Doğan, bi rastî jî gelê Kurd ketibû qonaxeke pir xerab. Ew qonaxa ku gelê Kurd nikaribû cejna xwe pîroz bike. Gelê Kurd tu car ew çehd ji cejna xwe dûr neketibû; navê cejna xwe ji bîra kiribû û ji xwe re bûbû biyanî. Ew qonaxa ku dewra Dehak dianî hişê mirovan. Ew qonaxa ku li gelek hêlên (deverên) Kurdistanê, gelê Kurd bi xwe digote: "Newroz cejna Ermeniyan e, gerek e Kurd û misilman pîroz nekin". Lê li gorî wan hemû mercên giran, dîsa jî Kawayê hemdem agirê Newrozê geş kir bi bedena xwe.

Bêguman di qonaxeke wisan de, vejîna gelê Kurd û pêxistina agirê Newrozê qet jî hêsan nebû. Lê vemirandina vî agirî jî qet hêsan nabe. Gelek car agirê Newrozê germ bûbû, sar bûbû. Lê tu wext weke vê carê sor nebûbû. Çawa tê xuyan, ew agirê ku Kawayê hemdem pêxist, Zekiye Alkan û Rehşan bi laşên xwe geş kirine û ew agirê ku bi xwîna hezaran egît, mêrxas û lehengan ve pêt daye zû bi zû û bi hêsanî nayê vemirandin heta serxwebûnê. Çiqas Dehak derkevin bila derkevin, Kawayên Hesinkar wê her car li hember derkevin.

*Tu bi xêr hatî bîst û yekê Adarê*
*Te ji bo me aniye mizgîniya biharê*
*Dîsa te li me aniye cejna salê*
*Cejna we pîroz be ey gelê Arî.*

*Li çiya û baniyan agir pêdixînim*
*Geş dikim û çavê dijmin dertînim*
*Ez cejn û Newrozan bîra xwe tînim*
*Pîroz dikim ala xwe jor hiltînim.*



*Newroz, ji alî hemû Kurdan ve bi awayekî roja serhildan, ji nû ve ve... û stand... ...af tê pîrozkirin. Di wêneyê de, pîrozkirina Newroza 1993'yan ku ji aliyên Kurdên Gurcîstanê ye... ...ê ve hatibû pîrozkirin, tê dîtin.*

# Agirê dilê te volqan e Reşan



M. Zahir Kayan

**Şeva Newrozê li Îzmîrê**
**Agirek bilind bû, Reşan bû dişewitî**
**Ew bû meşhela Newrozê**
**Xwe fidayî têkoşîna neteweyî kir**
**Şehîda Newrozê bû Reşan...**
*Reşan*
*Çavreşê*
*Roja bedew*
*Dilê min Çiyayê Etnayê*
*Bi xem e pênûsa min*
*Birînkûr im xwişka delal*
*Bira şev pirtî pirtî be Reşan*
*Îzmîr warê xelkê ye...*
*Ciwanê. Gulê. Nazenînê*
*Bi çi tewrê te biweşînim li cîhanê*
*Çawa bipeyivim ku evîna te bînim zimên*
*Agirê dilê te volqan e Reşan*
*Çiqas bi şans e welat*
*Evîndar tu yî şoreşgera bejinzirav*
*Zor e xerîbî*
*Bêwelatî mirin e dizanim*
*Tu beybûna Mêrdînê*
*Bi nav û deng î îro şûn ve Reşan*
*Serê welêt xweş be*
*Bira kor be neyarên te rêhevalê*
*Te ji bîr nakin tu car em*
*Tu di dilên me de yî ta mirinê bawer bike*
*Agirê Newroza me yî Reşan...*
*Reşan*
*Bala xwe didim mirinê*
*Ji her aliyî ve tê*
*Ji bo gişka na, ji bo hinekan tê*
*Bayekî dîn im dibezim li tenişta Sîpanê*
*Hezar gul e bêhna min*
*Ji hemêza serîhildanê têm, xema nexwe*
*Amade ne ji bo rizgariyê lawên Qadî Mihemed*
*Şehîda Bihuşta Winda*
*Şervanê, ji bo te reş girêda welêt*
*Çiqas bi wate ye*
*Ew agirê ku radibe ji can û laşên te*
*Bi te şên dibe Newroz, strana Nîştimanê*
*Bi te ve şanaz in em bawer bike Reşan*
*"Agirê Newrozê dawiya zilmê ye!"*
*Encama têkoşîn û serfiraziya gel e*
*Agirê laş û bilindahiya te*
*Delaliya dayîka xwe*
*Îro agir bi axîn e*
*Axîn û fîxan dike şev*
*Bîstê Adarê bi pirçî û made ye waxx Reşan...*
*Dibêjin qedexe ye*
*Qedexe ye li welatê te cejn û dîlan*
*Bakirina meşhela dardakirin e*
*Dîrûşim, serîhildan qedexe ye xwişka min*
*Riya mirinê ye ji bîranîna şehîdên rizgariyê*
*Çûyîna li ser gora wan qedexe ye Reşan*
*Sûc e welatparêzî, stêrka şaristanê*
*Gul û sosina Demawendê yî tu, bira agir şerm bike*
*Bira fedî bike zilm û xwînmêtî*
*Tu meşhela aşîtiyê...*
*Şervana yekîtiyê yî tu ta ezel/ebed*
*Bi navê te yên pîroz bin Newroz*
*Agirê ji bo te wê vêkevin her car*
*Wê bi navê te gurr be têkoşîna şervanan*
*Emê ji te re bibêjin xwişka Kawa*
*Di dilên xwe de emê pûtê te çêkin*
*Wêneyeke bêmirin î li hember zilmê*
*Em perestê daw û doza te ne waxx Reşan*
*Reşan*
*Xemkêş im, dilxerab im, lê bi hêvî me ez*
*Birînhezar im bawer ke*
*Bêxew im, bîstê adarê ye*
*Bi gul û geş im carinan,*
*Carinan ji dilê min xwîn diherike,*
*Li ber xebara barûdê mirî û mest im*
*Agirperest im*
*Reşanperest im ez...*
*Reşan*
*Reş e şev*
*Wek porên te*
*Çav û pirûyên te*
*Karkera welêt*
*Bi pesna yî tu bawer ke!..*
*Reşan*
*Newroz e îro, nûroj e, tol e*
*Tola bindestiya hezaran sala ye ev cejin*
*Mirinkemîn e, hilperîn e, jiyan e*
*Rizgariya ji nîjadperestiyê îro ye ev serîhildan li welêt*
*Berxwedan e keça heftgurçik*
*Şabûna bi miraz e ev cejin bawer ke*
*Cizîra Botan xwîn dikele*
*Dîrokeke nû dinivîse ev Elih*
*Ji xewê hişyar bûye Wan*
*Agirî pirçî ye, Ruhayê xinzîriya Romê seh kiriye*
*Berxwe dide ev welat xwişka min*
*Cejna xwe bi xwîn û girîn pîroz dike Reşan*
*Kêfa Cûdiyê li cih e, ji bo Nûh Pêxember na*
*Ji bo şervanan her wekî*
*Navçe bang dikin, fermo dibêjin*
*Ji şervanên rizgariyê re ev dem*
*Keçên bejinzirav şer dikin, dîlan digirin*
*Bi gernasî tevî xortên dest bi hene, deng dikin li cîhanê*
*Newroz e ev dem Reşan, şikandina qefesa zenghesin e îro*
*Heyna gernasî û mêrxasiyê ye şehîda welatê pîroz*
*Îro roj roja mirinê ye Reşan...*
*Reşan gul xeyidî ne, bêtenbûr e hozan*
*Welêt reş girêda, xortan hêsir rokirin ji bo te*
*Tu lorîka dayîka nîştiman î waxx Reşan*
*Reşan*
*Zor e xerîbî, bindestî, sifethinara xizaniyê dilbirîn e*
*Xayîn e şev, rêheval nîn e dizanim ev Îzmîr*
*Şîrhelalê, gula Kurdan rêhevalê, de rabe ji xewê*
*Ranebî girîn natemire li welêt, li diyarên bihuşta winda*
*Li hêviya te ye ew der bi çar çav*
*Evîndarê te ye warê têkoşeran*
*Xorta reş girêdan, dil negirtin bawer ke*
*Çavhêsir in ew îro şûn ve, lê şervan in ji bo te*
*Ji bîr nakin agirê bejin û bala te Reşan*
*Hozan ji te re gotin xerîbî, bi rûmet e riya te*
*Dawiya wê serfirazî*
*Te xwe şewitand, axîn kir, kire gazî*
*Bawer ke şehîda Newrozê, şervanên rizgariyê*
*Dizanin tu çi dixwazî*
*Ji te re gotin şev, tu bûyî xwişka rojê*
*Xweşî kete rûyê girtiyan, girînên xwe berdan*
*Jibîrkirin êşa birînên nepak, tu ketî bêriya wan*
*Agirê te giyanake nû xiste dilê wan keçikê*
*Tu bûyî berxwedan di girtîgehê de bi nav û deng*
*Navê te tol e îro şûn ve waxx Reşan...*
*Reşan*
*Xezala Sîpanê, îro şûn ve gul sor in, agir in*
*Nevê agir axîn e, Newroz e navê agir lêlê...*
*Sosina Cizîrê, neyar bi kîn e, felek xayîn e zeryê*
*Mirin li xerîbiyê dibe para te, gula ber bêhna gel, ca bipeyive*
*Bang bike, hişyar bike vê Îzmîrê çi dibe...*
*Ez bimirim ji bo te, xwezî bûbûya para min jî ew agirê te*
*Roja Newrozê mirin xweş e*
*Meziniya te*
*Bi pênûs nayê nivîsan*
*Têkoşîna te mezin e*
*Nayê serhev bi ziman*
*Bi te şanaz e*
*Gelê bindest waxx Reşan!..*

# Pênivîsa xwe ji hucreyê dirêj bike

*Berî her tiştî ez li ser navê xwendevanên te, bexşînetiyê ji te dixwazim. mamosteyê min, min çima ji te re got: "Mamosteyê mirovahiyê" ez vê vekim: Ez karim bibêjim tu agirê guleya gerîlayên Kurd î. Gava ku li ser çiyayên Kurdistanê gerîla çeka xwe diteqîne, mîna birûskê agirek ji ber guleyê dipeke û çiyayan ronahî dike. Şervan bi vê zehf kêfxweş dibin. Niha ev agir ji serê çiyayên Kurdistanê xwe berî newal û beriyan daye. Welat hemû bi vê ronî dibe. Ez te mîna vê ronahiyê dibînim. Bi vê ronahiyê tariya ku dewleta derîdem û nîjadperest li ser welatê Kurdan daniye, li ber vê roniyê ji hev parçe parçe bûye. Bi vî awayî mirov dikare bibêje bi şexsiyeta Kurdî te wêneya însaniyetê daye.*

**Ferec Kurêşivan**

Mamoste Beşîkçî ji bo kesayetiya Kurdî, ji bo însaniyê çi nivîsandiye, tehdeya ku dewleta Tirk ya nîjadperest lê kiriye, kesên ku li gerdûnê dijîn hemû dizanin. Ez di nivîsara xwe de mamosteyê mezin çi nivîsiye, qet hal û balê nakişînim. Bi kurtayî ez karim vê bînim ziman: Li hember mamosteyê mezin em Kurd hemû fedîkar in û şerm dikin. Ji bo çi?

Ango me hemû Kurdan ev mamosteyê mirovahiyê ji bîr kiriye. Kengê ku Beşîkçî ketiye zîndanê (an avêtin zîndanê) di çapemeniya ku ji xwe re dibêje em sosyalîst in de qet nivîsarek ji bo bîranînê neweşiya û tu ronakbîr di vê mijarê de berpirsyartî bi xwe re nedîtin. Ji ber vê yekê berî her tiştî ez hemû ronakbîran rexne dikim û xwerexnegiriyê ji wan dixwazim. Ya diduyan, xwendevanên mamosteyê mezin jî xwedî tewan in. Lewre mejiyê pir xwendevanan bi lêkolîn û pirtûkên mamoste vebûye. Bi vî awayî xwendevanan girîng bû ji bo bîranîna Beşîkçî dikaribûn nameyek bişandina çapemeniyê.

Mamosteyê mirovahiyê Beşîkçî;

Berî her tiştî ez li ser navê xwendevanên te, bexşînetiyê ji te dixwazim. Mamosteyê min, min çima ji te re got: "Mamosteyê mirovahiyê" ez vê vekim: Ez karim bibêjim tu agirê guleya gerîlayên Kurd î. Gava ku li ser çiyayên Kurdistanê gerîla çeka xwe diteqîne, mîna birûskê agirek ji ber guleyê dipeke û çiyayan ronahî dike. Şervan bi vê zehf kêfxweş dibin. Niha ev agir ji serê çiyayên Kurdistanê xwe berî newal û beriyan daye. Welat hemû bi vê ronî dibe. Ez te mîna vê ronahiyê dibînim. Bi vê ronahiyê tariya ku dewleta derîdem û nîjadperest li ser welatê Kurdan daniye, li ber vê rohniyê ji hev parçe parçe bûye. Bi vî awayî mirov dikare bibêje bi şexsiyeta Kurdî te wêneya însaniyetê daye.

Mamosteyê mezin;

Ezê niha carekê ku, min ji te re tiştek gotibû dixwazim bînim bîra te.

Min got mamosteyê min, xwendevanên te dibêjin ku, "Xoce (Bi peyva xwendevanan) di pirtûkê xwe de gelek tiştan ducar dike." Min xwest ez sedema vê fêr bibim. Te bersiveke filozofî da min:

– Dewleta Tirk her car eynî tiştî ji min dipirse û bi vê min tewanbar dike. Ez jî mecbûr im her tim eynî bersivê bidim.

Em bi hev re bi vê gotina te keniyabûn.

Rast e, dewleta nîjadperest her car eynî tiştî ji te dipirse, lê bes, tim bersiva te zêdeyî wan dimîne tu hilma xwe li zîndanê wan distînî. Bes ev qet zora te nabe û her tim tu bi ser dikevî. Ji ber vê yekê, ez dibêjim serkeftina te, ya gelê Kurd e.



Mamosteyê mezin, min ji hin xwendevanên te re got, ez dê ji bo bîranîna Beşîkçî di Rojnameya Welat de nameyekê binivîsim. Min got: "De ka hûn jî bi hevokekê Beşîkçî çawa dibînin, binivîsin." Hewqas tiştên xweş hate nivîsandin ez nikarim hemûyan bibêjim. Lê ezê vê yekê ji te re bibêjim. Xwendevanekî wisa nivîsand: "Ji dema Beşîkçî ketiye zîndanê û heta niha lêkolînên wî bi pergalî neweşiya ne. Ji ber vê yekê "Çepên Tirkan" tiştekî nanivîsînin lewre berê jî di kovarên xwe de nîvê rûpelan ji bo rexneya Beşîkçî û PKK'ê dihat veqetandin. Beşîkçî nikare binivîsîne, Çepên Tirkan ji nanivîsin. Ez dixwazim Mamosteyê min yê mezin tiştekî binivîse. Ji bo ku ew jî karibin ji xwe re tiştekî binivîsînin. Bi gotineke caîz Beşîkçî ji Çepê Tirkan re dibe madeya xav a nivîsandinê." Min tiştekî din ji xwendevanên te xwest: Li ser Beşîkçî hinek henek û pêkenok binivîsin. Tu kes nêzî vê pêşniyara min nebû. Gotin: "Hingî hurmeta me jê re heye, em nikarin di vê mijarê de binivîsînin."


Mamosteyê delal;

Ji bo bîranîna te ev nivîsa min pir derengî ket. Bes ev qet nayê jibîrkirin, tu di dilê gelê Kurd de dijî. Tu vê baş dizanî. Gava ku du xortên Kurd tên ba hev û li ser gelşa neteweyî dikevin gotubêjê, teşhîs, tesbît û gotinên te sedî sed tînin ziman û ruhekî bi sanî û şanazî dide gotubêjê.

Niha gotina min ev e, li ser navê xwendevanên te ez silavên bi germaya dil hatiye strandin ji te re dişînim. Emê ji te re pelek kaxez deynin tawleyê (maseyê) û tu jî pênûsa xwe ji hucreyê dirêj bike û binivîsîne. Daxwaza me hemûyan ev e.

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1– Romannivîsarê Rûs ê bi nav û deng ku di navbera salên 1828–1910'an de jiya ye. Romana wî ya herî navdar "Ceng û Aştî" ye. Di wêneyê de tê dîtin 2–Eşîret, grûp/ Akîs, eko/ Rengê zêr 3–Kirê, bi berdêla pereyan ji bo demeke kifşkirî bi destxistina tiştekî/ Di zaravayê Kurdî, Zazakî de Xwedê, Yezdan 4–Kevirekî bi qîmet/ Navekî mêran 5–Pirtikeke neyîniyê/ Aqara ku ji Mezopotamya heta Trakyayê dirêj dibe 6–Yad, dayîk/ Jan 7–Girar/ Di mîtolojiya Rojhilata Navîn de Yezdanê Rojê 8–Vexwarineke bi alkol/ Yax, rûn 9–Gerîneke heriyê 10–Vexwarina bingehîn/ Gazin

**Serejêr:** 1–Lêxistin, kutan/ Navekî jinan 2–Pêwendîdar 3–Pirça zirav û nerm/ Danekî rojê 4–Kesê ji Yezdan bawer nake/ Hiş, mejî 5–Hezar kîlo/ Dijberê mê/ Rûnê li ser mast 6–Dîn/ Qisim, şax/ Lîstikeke ku ji aliyê kesan ve bi 32 keviran tê lîstin 7–Neteweya ku li hêla Behra Reş dijî û bi giştî ji aliyê Tirkan ve hatiye asîmîlekirin/ Împaratoriyeke kevin 8–Navê elementekê/ Cureyeke nivîsa wêjeyî 9–Menzeleke xanî 10–Tebeqeya li dora Atmosferê 11–Jêhatî û çavvekirî 12–Riya hesin a trênê

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Şefîk Beyaz 2–Ezîtî/ Cahilî 3–Razîbûn/ Amîn 4–Îberîk/ Arî 5–Kal 6–Ko/ Revîr 7–Elo 8–Dram/ Ra 9–AA/ Ezan 10–ERNK/ ABC

**Serejêr:** 1–Şermoke 2–Eza/ Oldar 3–Fîzîk/ Oran 4–Îtîbar 5–Kîbele/ Me 6–Ûr/ Vê/ Za 7–Ecnî/ Rab 8–Ya/ Kurmanc 9–Aha 10–Ziman 11–Lîr 12–Çînî


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

*Kawayê Hesinkar û qralê zalim Dehak*

# Navê Medya bû Kurdistan

Zarokên me dilê me ne. Hebûna gel, hebûna zarokan e.

Hebû tune bû. Carek ji caran welatek hebû. Navê wî Medya bû. Medya welatekî bi dar û ber, bi gul û rîhan bû. Çemê wî fireh, çiyayên wî bilind, welatekî azad bû. Roja wî xweş, gelê wî rûgeş û serbilind bû.

Belê, gelê wî welatî pîr û bapîrên me Kurdan bûn. Lê dilxweşî û kêfxweşiya wî welatî pir dom nekir. Ewrên reş û tarî bi ezmanê wî welatî ket. Kêf û evîn, bû girî û şîn. Gul û rîhan çilmisîn. Êdî roja Medya ji ber çiyan melûl melûl û bi dilşewat hildihat. Ma gelo çi bûbû?

Li wî welatî qralekî xwînmij hebû. Navê wî Dehak bû. Dehak mirovekî zalim, bêbext û xedar bû. Bi darê zorê xwe kiribû qral. Malê gel talan dikir, keda wan dixwar, zarokên wan dibir ji xwe re dikir leşker û xizmetkar. Gava dê û bavê wan zarokan ew nedan, Dehak dest bi kuştinê dikir. Mala wan dişewitand. Ji ber vê zilm û zorê zarokek gazî dayîka xwe kir û got:

"Ez naxwazim bibim leşkerê Dehak. Dehak pir pîs e dayê. Nahêle em bileyîzin, yariyan bikin, bixwînin. Nahêle em ji dê û bav, heval û hogirên xwe hez bikin. Nahêle em li welatê xwe şa bibin. Dehak an me dikuje an jî, ji xwe re dibe."

Ji ber vê qêrîna zarokê, dayîka wî wiha bersiv da:

– Netirse kurê min. Wê roja me bê, hindik maye. Li hember wî zalimî wê mêrxasek derkeve.

Belê. Li wî welatî mêrxasek hebû li hemberî zaliman. Mêrxasek bi rik û gir û hêrsa salan hesin diheland. Lepên wî bûbû wek gurzan, zend û bendên wî bûbûn wek mertalan, dilê wî bûbû wek Çiyayê Herekolê. Zana, jîr û mêrxas bû. Navê wî Kawa bû.


Gava Dehak vedixwar, dîn û har dibû. Jana zilmê li serê wî dixist. Herdu marên xwe dida kêleka xwe, bi leşkerên xwe ve dikete nava gund û bajaran. Çi diket ber talan dikir. Dema zarok çav bi Dehak diket ditirsiyan, lîstikên xwe diterikandin, xwendina xwe berdidan. Hinekan jî xwe diavêt hembêza dayîk û bavên xwe. Lê ji destê Dehakê devbixwîn nedifilitîn.

Gava ku Dehak leşker û marên xwe berda ser zarokan, dayîka Kurd derket meydanê û qêriya:

"Ey Kurdên belengaz!.. Em mane bêser û sax. Dehak zarokan dibe. Çawa em bibin xelas. Tu Dehakê zilimkar, tu bi leşker û mar. Emê rojekê bibînin tê bimînî bêçar. Ez dayîkeke Medya me. Tu car ez neqediyame. Tovên min gelek in, di axê de jîn dan."

Kawayê Hesinkar rewş dîdît. Lê bi sebr û bêhnfirehî û bi rik difikiriya. Wî dixwest ku zarokên Kurdan bi hêz bin da ku Dehak bixînin û dawiya zilm û zordestiya wî bînin.

Dikanêka wan tijî gîsin, das, misas, tevir, bivir, kuling û bêr bûn. Lê Kawa di dikana xwe de şûr û mertal, xençer û xiştik, tîr û kevan, gurz û çakûç çêdikir.



Kawa hêdî hêdî ji dikana xwe derket ber bi gel ve meşiya. Gel jî der û doran, ji çar aliyî dihat. Çiqas diçû hejmara gel zêde dibû. Zarok, keç, xort, dayîk, bav, jin, mêr, kal, pîr.. Yek bû deh, deh bû sed, sed bû hezar û deh hezar. Cotkar bi misasan, nêçîrvan bi tîrkevan û riman, xort bi şûr û mertalan, pîr û kal bi dar û gopalan, zarok bi çetelan li dora Kawa kom bûn. Kawa derket ser dîwarekî bilind. Çavên wî wek çavên pilingan diçirisiya. Bi koloz, şal û şapik bû. Rih û simbêlên wî weke yên şêran bûn. Kawa bi heybet çakûçê xwe da ser milê xwe, kulma xwe bilind kir, silav da gel û got:

"Zarokino... Birano... Xuşkino.. Dayîk û bavino.. Bi mêrga me dileyîzin gur û çeqel û rovî. Li qada me dibezin mar û Dehak bi hovî. Me dît Dehak çi dikir bi salan me sebir kir. Bi xebat, bi dil û can îro me xwe hazir kir, Kawa Kawayê we ye. Bêyî we Kawa tune ye. Werin em dest bidin hev, pêşiya me ronahî ye.

Piştî van gotinan kêfa gel xweş bû. Zarokan yarî kirin, xwe avêtin hembêza Kawa û pêşiya wî. Kal û pîran destên xwe di serê wî dan, keç û xortan jî maçî kirin. Gel bi hev şêwirî, bû piste pista zarokan.

Lê, dilê Kawa şa bû. Kawa bi mêrxas û gernasan ve vegeriya dikanê. Xortan pifînî bi nixaf xistin. Kûre sor bû. Agir geş bû. Du xortên weke Rûstemê Zal hesin xistin nava agir, hesin sor bû, kelijî û dav qirt. rakirin danîn ber Kawa. Kawa çakûç girt nav lêpên xwe yên mezin, bi van zend û bendên pehlewanî hesin da ber derban. Di demeke kurt de gurzeke bi teqîn deranî û danî ber xortan. Kawa berê xwe da gel û bang kir:

"Hevalino.. Hogirino... Bi salan e ku me ji bo vê rojê tîr û kevan, şûr û mertal, rûm û gûrz, xençer û xiştik çêkirin. Îro roj roja xebatê ye. Welat bêxebat û bêlebat rizgar nabe. Divê em yekdest û yekmil bin."

Kawa bangî kal û pîr û xort û zarokan kir. Şêwr û mişêwrên xwe danîn. Ber bi êvarê hemû mêrxas, pehlewan û gernas amade bûn. Gişt li hêviya dengê Kawa bûn. Kawa got:

"Gelî egît û pehlewanan. Îro roj roja mêraniyê ye. Divê em vê zilm û zordariyê ji ser xwe rakin. Welatê xwe ji nû ve ava bikin. Baş bizanibin ku bêxebat kes xelas nabe. Hevalino... Hûn dizanin Dehak îro jî avêt ser gund û bajaran. Zar û zêç birin, mal talan kirin. Lê min bihîstiye ku Dehak dixwaze îşev vê zilm û zordariya xwe pîroz bike. Piştî her talaneka xwe li qesra xwe şahiyekê çêdike. Ew û leşkerên xwe dixwin, vedixwin, serxweş û sermest dibin. Ev jî ji bo me keyseke mezin e ku em bi hêsanî êrîşî ser qesrê bikin. De rabin em bi rê bikevin gelî egîd û mêrxasan."

Di destpêka şevê de xort bi şûr û mertal, pehlewan bi gûrz xençer, mêrxas bi tîr û kewan ber bi qesra Dehak ve meşiyan. Berî roj hilê xwe gihandin ber qesrê. Kawa hemû pehlewan û mêrxas û gernasên xwe li hawirdorê qesrê bi cih kirin. Paşê bang li çend hevalên xwe kir û got:

"Gelî hevalan, divê ku yek ji me bikeve hundirê qesrê. Li rewşa hundir binêre û deriyê mezin veke."

Kurekî Kawa hebû biçûk bû. Navê wî Jîr bû. Wek navê xwe zîrek û biaqil bû. Ew jî li gel bavê xwe bû. Jîr xwe avêt pêş û got:

"Bavo destûr bide ez herim hundir. Ez biçûk im. Kes bi min nahese."

–Gelî hevalan, ev karekî dilsozî û dilxwaziyê ye. Madem Jîr dixwaze bila here. Jîr jîr in.

Mêze bike kurê min. Hay ji xwe hebe, şaşiyek dikare bibe sebebê jiyana te. Niha emê werîsekî bi çengel biavêjin ser dîwarê qesrê û tu yê pê hilkişî herî jor. Paşê di kuleka qesrê de têkevî hundir. Baş temaşe bike. Kî çi dike. Pişt re çengelê deriyê qesrê veke. Baş e.

Jîr çû jorê. Li ser dîwarê qesrê li derdora xwe nihêrî. Nobedaran şarap vedixwar, serxweş bûbûn. Ji xwe re stran digotin. Bi Jîr ne hesiyan. Jîr xwe ber bi qesrê ve xişikand. Dehak li gel mar û leşkerên xwe şarabê ser serê xwe de dikir, mar rabûbûn lotikan. Di nav dengê serxweşan de dengê Dehak ê devbixwîn bilind dibû:

"Bînin, ji min re zarokên Kurdan bînin. Bila zarokên Kurdan nexwînin. Bila nebine mirovên baş. Ez dewleta Kurdan naxwazim. Bila Kurd bindest bin.

Jîr hat pişt deriyê qesrê. Bi pêçîkên xwe yên biçûk çengelê mezin û qirase bilind kir. Pişt re çû ser qesrê û îşaret da bavê xwe.

– Bijî Jîr. Tu çavê min î.

Kawa da pêşiya gel, êrîşî qesrê kirin. Kawa xwe seranser gihand cihê Dehak. "Ey Dehakê zilimkar. Bi van herdu marên har. Te zar û zêç qir kirin. Malên me kirin tar û mar. Bi teqla çakûçê min, êdî qediya zilma te. Bila bijî gelê min."

Dehak ji cihê xwe rabû. Nihêrî ku Kawa bi çakûç li ser serê wî sekiniye. Marên Dehak li erdê ji tirsan lerizîn:

"Ez feqîr im, ez reben im. Zarokên min hene."

– Zarokên te zarok in gelo ma yên Kurdan ne zarok in ha. Marê pîs î diqdiqî. Tu hîn behsa zarokan dikî. Em dest nadin zarokên te. Bila zarokên te bileyîzin, bixwînin, yariyan bikin. Lê tu.

– A ji te re

– Aaaaaaaa.

– De bixwe

– Vaaaaaaa"

– Ev ji bo zarokan. Ev ji bo dayîkan. Ev ji bo pîr û kalan.

Kawa êdî dawiya zilm û zordarî û jiyana wî qedand.

Lê ne mar, ne jî leşker bi hewara Dehak ve hatin.

Jîr çû serê qesrê agirekî mezin pêxist. Bi agirê Jîr re li çar aliyê welatê Medya agirê kêf û şahî û azadiyê bilind bû.


Roj, 21'ê Adarê bû. Dem hat, devran guherî. Navê Medya bû Kurdistan. Agirê azadiyê her geş dibe li serê çiyan.

***Amadekar: Rênas Azad***

*Çend wêne ji jiyana Apê Mûsa*

# 'Vêca lawo ez çi bibêjim!'





■ Apê Mûsa got: "Lawo tu yekî û civat bîst kes in. Ji van deh heb zêdetir nizanin bi Tirkî. Mamosteyê Tirk dikene, "Ha, ha, ha! Bila teva bixwenda. Çima halo nezan mane?" Min xwe negirt û min got: "Mamoste hinekî hêdîka bipeyive. Derdora me wê bibêjin ev çi deng e." Apê Mûsa li min zivirî û got: "Lawo dev jê berde. Ma te dîtiye ku ker bi hêdîka zirriye?"

**Jîr Dilovan**

Dibe ku xwendevan bibêjin, ne salvegera şehîdbûna Apê Mûsa û ne jî tiştekî din e. Ev nivîs ji ku derket? Lê xewn û bîranînan, ew peyv û henekên wî ew anîne bîra min û min xwest ku ez hinek bîranînên wî bi xwendevanan re par bikim. Her wiha hê bêhtir Apê Mûsa nas bikin.

Apê Mûsa rojê pênc–şeş saetên xwe didane xwendin û nivîsandinê. Gelek caran ez diçûme mala wî. Min li zingil dida. Dema pêjna wî nedihat, min zanibû weke her car ketiye xewê. Min derî hêdîka vedikir û diketime hundir. Carina pirtûka Arîsto, carina a Sokrates û carina jî a Heredot di destan de bû. Bi wê rewşê bi xew ve çûbû.

### EZ BÊSER Û BER DIHERIKIM

Dîsa rojekê havîn bû û bi wî awayî min ew ji xew rakir. Ji lew re rûniştî di xew re çûbû û hê pirtûk di destan de bû. Şiyar bû û got: "Lawo, şaîrekî Kurd hebû. Digot, ez mîna Dîcle û Feradê har û bi pêl im. Lê ez çi bikim, ez bêser û ber diherikim. Vêca lawo ez çi bibêjim... Min emrê xwe bi xwendin û bi têkoşînê borand. Lê min a dilê xwe bi cih nekir.

Xanî û bexçeyê wî li Stilîlê û wan derdoran deng daye. Hêtê (dîwar) xanî bi darpêçanek û çîçekan xemilandiye. Kevirên xanî qet xuya nakin. Bexçe tije dartam e. Hemû cureyên daran lê hene. Rojekê got: "Dara ixlamûrê tenê kêm e. Ezê wê jî biçînim." Gelekî hez ji dar û beran û gul û çîçekan dikir.

### MA KER HÊDÎKA DIZIRE?

Dema hewa xweş bûya, em tim li nav bexçeyên wî rûdiniştin. Ji peyv û henekên wî me nizanibû dem çawa dibore. Rojekê em qederê bîst kesî li nav bexçe rûniştibûn û me guh bi ser de pêl kiribûn. Ji me re qala dîroka Kurdistanê dikir. Hê em wilo, mamosteyekî ji Kastamonu bi navê xwe Hiseyn hat û di rex min de rûnişt. Ji ber ku ew palpalî bû û aqil sivik bû, Stilîliya jê re digotin "Hiseynê Dîn". Çawa rûnişt, ji nişka ve bi dengekî Dawidî got: "Apê Mûsa ji kerema xwe re bi Tirkî bipeyive da ez jî bizanibim tu çi dibêjî." Apê Mûsa got: "Lawo tu yek î û civat bîst kes in. Ji van deh heb zêdetir nizanin bi Tirkî. Vêca ezê çima bi Kurdî nepeyivim? Mamosteyê Tirk tîqe tîq kir, keniya û got: "Ha, ha, ha! Bila teva bixwenda. Çima halo nezan mane?" Min xwe negirt û min got: "Mamoste hinekî hêdîka bipeyive. Derdora me wê bibêjin ev çi deng e."

Apê Mûsa li min zivirî û got: "Lawo dev jê berde. Ma te dîtiye ku ker bi hêdîka ziriya ye?"

### JI DIYA TE RE KUTILKAN JÎ ÇÊKIM?

Dîsa rojekê ez û ew bi tenê li nav bexçe bûn. Deriyê hewşê go zîq û vebû. Keçikeke heft–heşt salî da devê derî û hat. Got: "Apê Şêxo" (Navê Apê Mûsa yê din) Apê Mûsa got: "Çi ye lawo?" Keçikê got: "Diya min go here ji bo kutilka hinek hurikê savarê bîne." Apê Mûsa çû ji hundir kîsekî naylon jê re dagirt û anî da dest. Keçikê sê gav avêtin û dîsa got: "Wele diya min go bila kefçiyek ava bacana jî bi de te." Apê Mûsa çû ava bacana jî jê re anî. Keçik di cih de ma sekinî û neqeliqî. Apê Mûsa got: "Çima tu naçî lawo?" Keçikê got: "Wele hate bîra min diya min gotibû seriyek pîvaz û qevdek bexdanus jî bîne." Apê Mûsa got: "Ka lawo ka wana jî bide min, ezê kutilkan çêbikim û ji diya te re bişînim."

### ÇIYÊ TIRKIYEYÊ MA?

Sal 1986 bû. Li Stilîlê ez li dibistanê rûniştibûm. Apê Mûsa li derî da û hate ba min. Em rûniştin û me çaya xwe vedixwar. Hê wilo me dît du mifetîşên perwerdeyê ketine hundir. Me bi xêrhatin da wan. Piştî hevnasînê, peyiv hate ser PKK'ê. Lew wan rojan livbaziyên PKK'ê pêşketibûn. Mifetîşekî ji wan ku ji Elezîzê bû, ji dehma xwe de got: "Ew du sê eşqiye ne. Kengê bi artêşa Tirkiyeyê karin..." Apê Mûsa lê zivirî û bi nermayî got: "Binêre mifetîş beg! Li gerdûnê di hiqûqê navneteweyî de sê tişt hene ku dewlet bi wan têne nasîn û têne pejirandin. Pesepor t, dirav (pere) û ala neteweyî. Îro em dinêrin heta bi Bangledeş bê vîze peseporta Tirkiyeyê napejirîne. Diravên Tirkiyê jî, ji Edîrne û wê de nayê nasîn. Li hundirê Tirkiyê jî êdî hemû tişt bi mark û dolaran e. Ma çiyê Tirkiyê? Ma al. Al jî parçeyek paçik e. Tu karî bi her derê ve daleqînî.

Mifetîş bû dizê sola xwe. Hew peyiv jê çêbû. Tenê gote Apê Mûsa: "Ma te lîse qedandiye?.."

Di dawiya nivîsa xwe de, dixwazim helbesteke xwe ku piştî xewneke şevê min Apê Mûsa dîtibû binivîsînim.

### PIŞTÎ XEWNEKE ŞEVÊ

Tu xuyayî  
Te dibînim  
Û li her derî  
Tu xalînabî ji berçavan  
Li ezmanan ewrên spî  
Li beriyê dexla şîn  
Li ser çiyayên bilindberf  
Û li Stilîlê  
Kevokên xalxal  
Te bi bîra min tînin  
Xortê porspî  
Kaniya zanyariyê  
Hînkaya dilan  
Û aştîxwazê gerdûnêyî tu  
Dil der dibe  
Lê tu der nabe ji dil.

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûnerên Rojhilata Navîn (Ortadoğu Temsilcileri) Fener Rojbiyanî – Jan Dost
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tigrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık